## Çîrokên bênavend û bindestiya serdest(!)

Di romana Îrfan Amîda de, mekan, obje, deng, ba, şev, reng û hemû tişt wekî metaforîk di nava valahiyekê de, bi zemên re zindî dike. Temsîliyeta wan têgihan û aciziya mirov di çarçoveyeke hunerî de, bi awayekî ji manewiyatê wêdetir rastî û xeyalê digihîne hev... ***Sîdar Jîr / R.5***



## Westworld: Nûcîhanên kolonyalîzmê

Westworld rêzefîlmeke honaka zanistî û dîstopîk a platforma HBO'yê ya Amerîkayê ye. Afrînerên wê Jonathan Nolan û Lîsa Joy xwe dispêrin pêşnûmeya Michael Crîchton a ku bi heman navî di sala 1973'an de nivîsîbû. Westworld li ser wê mîta amerîkayî ya ku ji bo ax û warê gelên çermsor afirandibû hatiye ristin... ***R.11***



# xwebûn

24-30 GULAN 2021 HEJMAR: 75 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Heta qirikê ketine heriyê

Dewleta tirk hem di polîtîkayên navxweyî û hem jî di polîtîkayên navneteweyî de îflas kiriye û her wiha ji bo civakê bixapînin û xwe bihêz bidin nîşandan şer wekî çareseriyekê didin nîşandan. Lê her ku di polîtîkayên şer de israr dikin heta qirikê dikevin nav heriyê. Rêveberê saziya Kurd Bê Sînor Qadar Pîrî têkildarî operasyona dersînor ji rojnameya me re axivî... ***R.6***

## Divê kurd xwedî li hebûna xwe derkevin

Di van çend salên dawî de dewleta tirk ji bo di şerê li dijî kurdan de encam bigire û polîtîkaya xwe ya dagirkeriyê li herêmê bi cih bîne, di nav êrîşeke berfireh de ye. Ev êrîşên piralî bi qada leşkerî tenê ve ne sînordar in. Di qada siyasî, çandî û civakî de jî ji bo îradeya kurdan neyê temsîlkirin çi ji dest tê dike. Di bin navê cuda de li ser kurdan êrîşên qirkirinê tên meşandin. Li dijî van êrîşan heya niha asta berxwedana ku derketiye holê jî sînordar e. Ji bo vê berxwedanê bişikîne û di siyaseta xwe ya qirkirinê de bi ser bikeve gelek sûcên mezin tê kirin. Jê cuda, li hemberî van heya niha ji derveyî raya giştî ya kurd û Çapemeniya Azad tu kesî dengê xwe nekir. Lewre ev siyaseta qirêj a li ser civaka kurd tê ferzkirin jî ji nedîtinê ve hatin. Tevî li herêmê sûcên di qada navnetewî de wekî sûcên mirovahiyê tên pênasekirin û jiyîn... ***Felemez Ulug / R.6***



### *Simbil hişk bûn, cotkar deyndar in*

*Li Kurdistanê cotkar ji ber ziwabûnê û zêdebûna mesrefan, ketine halekî wisa ku hema bibêje nikarin erdên xwe bajon. Îsal hişkesaliyê zirareke mezin da cotkaran.. Cotkar Azîz Çinar wiha axivî: "Her tişt hişk bûye. Ji ber ziwabûnê genim qam neavêtiye. Simbil bêxêr bûne. Berê me serê donimê 2 ton genim werdigirt, lê niha bi zorê ton û nîv jê tê."...* ***R.3***


## Nêzîkdayîna feylesofî

Gava ku em danişin û bi rêyeke rast li ser halê xwe biponijin, divê em an hişê xwe bixwin an jî xwe bikujin. Lê nabe, me nekiriye û em nakin. Em newêrin hevrûyî xwe bibin û lewma jî ji xwe direvin. Dewsa bixwazin hevrûyî kela dilê xwe bên, an jî eş û kulên xwe bibînin, em berê xwe didin derveyî xwe. Lê digerin ku hinekan bibînin û bikin ber sûcên kula dilê xwe. Ji ber ku heyanî em bi awayekî bi êşa dilê xwe re çareyekî nebînin, nikarin jiyana xwe ya rojane bi asayî bimeşînin, an jî ne pêkan e ku wek her gav kar û barên xwe bikin. Li gorî çanda gel û civatan her kes bi terzekî... ***Ehmed Pelda / R.7***

## Ukrayna veguherî qada hovîtiyê

Îro em encamên hilweşîna Sovyetê dibînin. 30 sal piştî hilweşînê pêvajoyên li welatên sînor ên li derdora Rûsyayê gihîştine dawiya xwe ya mantiqî, fîzîkî û dîrokî. Li her derê rewş cuda ye, lê li her derê neyînî ye. Bi berhevdana rewşa jeopolîtîk û civakî-aborî ya îroyîn a li welatên piştî-Sovyetê yên dorhêla Rûsyayê, îro û 30 sal berê, mirov dikare xirabiya wê ya cidî destnîşan bike. Bi rastî, her welatekî Sovyeta-berê xwe di dereceyên cur bi cur ên hilweşîna aborî û nakokiya kûr a îdeolojîk a navxweyî de dît. Çavdêriyeke bihêz heye ku dibêje tiştên girîng li cîhanê... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.6***

# Qada online derfeteke baş e ji bo zimanê kurdî




Di van demên dawî de bi taybetî jî ji ber şert û mercên pandemiya vîrûsa covîdê piranî kar û xebatên civakî, edebî û aborî êdî li ser platformên dîjîtal tên kirin. Her wiha em zanin gelek sazî û dezgehên ziman û edebiyata kurdî jî vê qada online baş bi kar tînin û heta niha gelek program û proje jî di vê qadê de didomin. Komxebata Helbestê online xebatên xwe dike pirsên rojnameya me bersivandin... ***Hevpeyvîn Emîn Aksu / R.4***

## Pêşxistina zimên...

Ziman daneheva civakî ya zihniyet, ehlaq, hîs û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û zihnî ya mane û hîsê ya serwextbûyî ye. "Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketîbûna jiyanê ye." Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêş de biribe, ew tê wê maneyê ku asta xwe ya jiyanê jî pêş de dibe... ***Adar Şaman / R.2***

## Şewey Qralan

Hepisxaneyêk bifikirê, mîyanê koy de wo û îdareyê hepisxanî destê mehkûman de yo. Hepisxaneyo bi nameyê xo "La Maca" mîyanê welatî de bi name û veng o. Bi merdimê ke semedê dizdî, tiryak, xapênayîş û kiştişê merdiman hamiyî girewtişî hepisxane kerdo pirê. La taybetîyêk enî merdimanê hepisxanî esta ke goreê kulturê welatê xo hereket kenê, bawerî înan goreyê edetann înan zehf xurt a. Edetêk aneyîn est o.. ***Cemîl Oguz / R.9***



## Dahênerê romanê

Îsal salvegera 43'yan ya wefata nivîskarê romana ewil ya kurdî Erebê Şemo ye. Erebê Şemo ji malbateke şêxên êzîdiyan bû. Şemo wekî dahênerê romana kurdî tê zanîn... ***Ugur Dursun Adsiz / R.11***

## 'Sifte cenîyan bikişê'

Pêro dinya sero netew dewletî ser şarî de taybet ke şaro ke vera hukumdariya înan xoverdano, tekoşîne dano lej kenê. Hama lete na lej kî dizda yeno ramitene. Namê xo kî lejê taybet o. Nê polîtîkayanan tewr zêde wazenê ke cenî û gencan teslîm bigêrî. Wazenê hîn bikerî, ne gencî ne zî cenî dûstê înan de, dûstê zilm û zorvajiyî de vengê xo berz mekerî. Hukumdarî qesê 'Sifte cenîyan bikişê' hîn tol nêvatî. Waxto ke cenî kerdî bêveng, cenî ke taqate ra dayî warî homete ke kenê binê tesîrê xo.Her gucike dinya de cenî rastê zorvajiye yenê. Hama waxto ke jû cenî kewayirê kamayisê kurd bîye o waxt herîşî jêdena benê giran. Her hetî ra rastê herîşkarîya dewlete yenê. Eskera ya kî gurete polîtîkayê taybet ser cenîyan de yenê ramitene... ***Meral Ozel / R.9***

## Nivîşta mîzê

Şêxê ku herêma wî Hezro, Licê û Pasûr bû, bi destpêka biharê re şêx û mirîdê xwe diçin zozanan. Ji ber ku di vê demsalê de gundî jî hemî li zozana ne; bi hatina şêx re gundî çi pirsgirêkên wan hebûn dihatin ji şêx re digotin û şêx jî li gorî pirsgirêkan ji gundiyan re nivişt çê dikirin. Gundî bi nivîştên şêx xenî bibûn. Lê ya pîrê ne tê de. Li vî gundî pîrek bi navê Fatê hebû. Pîra Fatê ji yekî gundî re dibêje: "Kurê min ez çi ji te veşêrim. Ji Xwedê nayê veşartin. Ez şevê deh caran dertêm derve. Û rûyê min jî nade ku ji şêx re bibêjim. Tu karî ji şêx re bibêjî bila ji min re jî nivîştekê çêbike... ***Riza Uyar / R.10***

rupel 2++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:44 Page 1



# Pêşxistina zimên, peywira welatparêziyê ye



Adar Şaman

Civak, bi hebûna çand û zimanê xwe manedar dibin. Her civak ango kes pirsgirêkên xwe bi zimanê xwe çareser dike. Gelo em bi kîjan zimanî kul û derdê xwe çareser dikin? Bi zimanê serdestan tu pirsgirêk nayê çareserkirin; berovajî civak tên parçekirin!

Cejna zimanê kurdî ku her sal di 15'ê gulanê de tê pîrozkirin; îsal mîna bayê bablîsoka havînê hişk li hinek deveran da û yekser derbas bû. Gelek sazî, kesayet, rêxistin, platformên civakî, komeleyên ziman ên rasterast xizmeta zimanê dayikê dikin daxuyanî dan û gelek nirxandin, şîrovê, gazinc û rexne pêş xistin. Cejna zimanê zikmakî wiha nayê pêşwazîkirin! Bendewarî ew bû ku tevahiya sazî, komele û rêxistinên kurdan; di derbarê pêşketin, kar û xebatên sala borî de bo zimanê dayikê hatine meşadin tevî encamên wan, ji raya netewa kurd re aşkera bikirina. Ji ber ku xebatê van saziyan ên derbarê zimanê kurdî de nayê zanîn bê ka çi dikin.

Lê sed mixabin ev yek pêk nehat. Gelo çima sazî, rêxistin û partiyan ev erka xwe di roja cejna zimanê kurdî de pêk neanîn? Madem wan negotin em aşkera bêjin; Partî, sazî û rêxistinên kurdan ên li welêt û derveyî welêt in, di der barê xizmeta pêşketina zimanê zikmakî de lawaz tev digerin, lebata wan hêdî – hêdî ye. Bi tirs dixebitin, gotin û rexne pir in, lê çalakî pir hindik e. Liv û tevger kêm e. Bi gazincan ziman û çand nayê parastin. Ziman, bi lebat û xebatê bi pêş dikeve.

Di pevajoyên kaosê yên gerdûnî de hem pêşketinên şoreşê û hem jî yên li hember şoreşê di zik hev de pêş dikevin û teşe digirin. Guhertinên democratîk, hêviya ji azadiyê û yên totolîterfaşîst di nav hev de tên jiyîn. Pêvajoyên kaosê wekî sê merheleyan heyîna xwe didin domandin. Destpêka kaosê pergal di rewşa şaqizmayînê de ye, ê çi bike ne diyar e, pêvajoya navîn sazî, rêxistin û destkeftiyên civakî ji bo tesfiyekirina wan êrîşkar tev digerê û hema bê çi bi dest bikeve talan-xesp dike. Bi vê yekê dixwazê hebûna xwe mayînde bike. Merheleya kaosê ya sêyem ango ya herî dawî; îca di vê merhaleyê de xwîn ji desthilatdariyê diçe, lewaz dibe, bê hêz û nexweş dikeve. A niha desthilatdariya qaşo ku Tirkiyeyê 'bi rê ve dibe' di rewşa nexweşê herî giran de li ber sekeratê diperpile.

Di vê pêvaoya ku siyaset, pergal, aborî, desthilatdarî di nav rizîbûnek kûr de dijî, ne xwedî hişmendiyek çêker û avaker e. Mîsyonek xirab a talangeriyê dilîze. Her nirxê civakê talan dike, destdirêjî û zimandirêjiyê dike. Ew di nav çirava dizî, bêdadî, bêehlaqiyê de bi derdê berjewêndiyên xwe û parastina desthilata xwe ketiye. Bi şev û roj sebir û tebatî bi vê desthilatdariyê nakeve; kula wan tune ew e ku bi xwînmijiyê li ser desthilatdariyê bimînîn. Armanc jê ew e ku civakê hîn bêhtir parça bike û bi vî awayî bi rê ve bibe. Civak, çiqasî bê parçekirin dê ewqasî baştir bê doşandin.

Ma dibe ku gelê kurd, sazî û dezgehên demokratîk, komeleyên mafê zimên û perwerdehiyê diparêzin, ji vê rejîma nexweş a ber çûyînê ye daxwaza azadî û mafê zimanê kurdî bikin? Heger ku rewşek wisa hebe jî, qetiyen nayê pejirandin. Divê kurd destê xwe li ber vê desthilatdariyê raber nekin û xwe tenezûlê parsekiyê nekin. Ev ne layîqê têkoşîna bi sed salan a şoreşgerî û çanda welatparêziyê ye. Ji ber ku gelê kurd vê siyaseta înkar, biçûkxistin, tunehesibandin qebûl nake û li dijî hebûna xwe dibîne, têdikoşe. Têkoşîna, demokrasî û nasnameya azadiyê, alternatîfa yekem a desthilatdariyê. Wê ev jî bi vîna jin, ciwan û civakê ji nû ve xwe bi rêxistin bike. Civak encex xwe bi rêya rêxistinbûyînê li hember siyaseta pişaftin, qirkirin, biçûkxistin, destavêtin û zayêndparêziyê bi hêz bike. Ji vê yekê re wêrektî-berxwedanek civakî pêwîst e. Bi kesayetên têkoşer pêkan e.

Ya rastî di hêla pêşxistin û parastina zimanê zikmakî de sazî û tevgerên jinan hinekî kêmasî dijîn. Di vê babetê de ne xwedî rêxistinek şênber a kar û xebatên kurdolojiyê ne. Pêdivî bi rêxistin-sazîbûyîna ziman a di pêşengiya jinan de pêşbikeve, heye. Nebûyîna vê saziyê kêmasiyek mezin e. Di hêla pêşxistina perwerdeya bi zimanê dayikê, valatiyên ku hene meseleyek bîrdozî û hişmendiyê ye. Ev dibe sedem ku di mijara parastina zimanê dayikê de mêr derkevin pêş. Li gorî ku ziman heyînek berhema keda dayikê ye, li gorî ku tê xwestin parêzvaniya zimên ji hêla dayikê ve nayê geşkirin. Diviyabû ku jinên kurd, ji her kesî zêdetir xwedî li zimanê zikmakî derketan, ji bo pêşdebirina zimên saziyên taybet ên perwerdeya zimanê kurdî ava bikirana. Lê em di vê mijarê de kêm dimînin û mîna karekî xwe yê bingehîn nahesibînin.

Ziman daneheva civakî ya zihniyet, ehlaq, hîs û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û zihnî ya mane û hîsê ya serwextbûyî ye. "Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketîbûna jiyanê ye." Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêşde biribe, ew tê wê maneyê ku asta xwe ya jiyanê jî pêş de dibe. Civak, xwe li ser estetîzekirina pêşketina ziman îfade dike. Yê ku çandê diparêze asta pêşketina ziman e, ji ber ku ziman heyîneke çandî û civakî ye.

Pêşketina zimên ji desthilatdaran nayê xwestin û lavakirin; bi axaftin, nivîsandin û xwendinê tê pêşxistin, bi pergala perwerdeyê tê parastin. Civak, bi hebûna çand û zimanê xwe manedar dibin. Her civak ango kes pirsgirêkên xwe bi zimanê xwe çareser dike. Gelo em kurd, bi kîjan zimanî kul û derdê xwe çareser dikin? Bi zimanê serdestan tu pirsgirêk nayê çareserkirin; berovajî civak tên parçekirin! Bi zimanê zalîm û desthilatdaran raman, kesayet, çand û ziman azad nabin. Ji bo ku ziman bigiheje nasnameya xwe ya azad, têkoşîneke bêhempa ya neteweyî pêwîst e.


Wek encam em dikarin bêjin ku pirsgirêka herî mezin a li pêş pêşketina zimanê dayikê asteng e; parçebûna navxweyî ye ya ku civaka kurd dijî. Parastina ziman peywîrek welatparêzî û erka siyaseta neteweyî ye. Siyaseta neteweyî ya kurd, heya niha ji bo pêşketina zimanê zikmakî çi kar û xebat meşandiye? Gavên şênber ên vê xebatê çiqasî encam bi dest xistine? Zimanê dayikê mîna şîrê dayikê delal, helal û şîrîn e. Zaroka ku bi şîrê dayikê mezin dibe, saxlem, xweşik, zana û qayîm e. Ziman li cem kurdan her tişt e; hebûnek jêveneger e. Civak bi zimanê dayikê bi qedir û qîmet e. Heyanî ku kurd, zimanê dayikê nexin zimanê jiyan û perwerdeyê, dê her feqîr û hejar bijîn. Kengê me xwe ji vê rewşa parçeparçebûyînê rizgar kir, wê hingê zimanê kurdî dê bibe zimanê fermî yê perwerdeya civakê.




# Ax, xwezî li rojên berê!

Ger zimanê kevir û latan hebûya, wê bi dehan çîrokên rêwî û koçeran vegotibûna. Di heman wextê de rexmî pêşketina teknolojiyê, dayikên ku girîngiya alavên kevnar di roja me ya îro de dizanin, heta niha bi kar tînin rewşeke taybet destnîşan dikin. Yek ji wan alavan jî meşk e. Fatima El-Xitban a 70 salî heta niha meşkê bi kar tîne.

Fatima da zanîn ku rexmî pêşketina teknolojiyê ew naxwaze dest ji meşkê berde û wiha got: "Di salên dawî de êdî mekîneyên kilandina dew derketin lê di dema me de tiştekî wiha tune bû, her tişt bi kedê çêdibû. Malbatên mekîne li gel wan hebin, dema cereyan tê li ser wê çêdikin lê ger cereyan tune be ew jî bi meşkê dikêlin. Berê her tiştî bi kedê dihat çêkirin, pir xweş û bi wate bûn."



Di axaftina xwe de Fatima bal kişand ser ruhê komînal ê li gundan û ev tişt anî ziman: "Her jinek li gorî hejmara pezê xwe meşkê jî çêdike. Ya herî xweş li gund ew e ku mala meşka wê tune be, dewê cîranên xwe dikeyînin û alîkariyê didin hev. Yên berê çawa bûn, yên niha jî wiha ne, çanda gundan ji ya bajaran pir cudatir e. Ger mekîne û ferazeya şîr jî nebin, jin meşkan çêdikin û bi kar tînin. Jin ji tunebûnê hebûnê diafirînin."

Fatima got ku xwezî rojên berê û wiha ew roj bi bîr xistin: "Ax, xwezî rojên berê di roja me ya îro de bûna. Ji ber xêr û bereket pir bû. Berê em her koçer bûn, ji çêkirina konan û tevnan me gelekî hez dikir û çêdikir. Berê jin hemû li ber konan bi meşkên xwe digirtin û dew dikêlan û distirandin. Li kêleka karê xwe, dengbêjî jî bi pêş dixistin."

Her wiha Fatima bi vê hêviyê dawî li axaftina xwe anî: "Ez pir dixwazim jinên niha fêrî alavên kevnar bibin û wan bi kar bînin. Keçika min a mezin piştî ku zewicî ew jî fêrî meşkê û heya niha jî bi kar tîne. Ez naxwazim ev çand winda bibe, ji ber ku ya dapîrê me ye û divê neviyên me jî paşguh nekin." ***HESEKÊ***

# Dîmenên xeyalên xwe xêz dike

Pîşeya xêzkirina wêneyan li gel kesên xwedî hest û meraq tê dîtin. Roşan Sîno jî bi xêzkirina wêneyan hestên xwe xêz dike û êşa gelê xwe yê ji warên xwe koçber bûne parve dike. Wê dîtiye ku karê nîgarvaniyê hestek cuda li gel wê ava dike. Roşan Sîno ji 8 saliya xwe de dest bi xêzkirina wêneyan dike. Roşan 15 salî ye û ji navçeya Mabeta ya Efrînê ye. Ev 7 sal in Roşan temenê xwe bi wêneyan re derbas dike û gelek xebatên wê di warê hunerî de hene.



Derveyên wêneyên bi rengê xwezayê piranî wêneyên Roşan li ser koçberiyê ye. Roşan ku bi piştgiriya malbata xwe gihiştiye vê astê, got ku ew piranî xeyalên xwe xêz dike.

**Nehiştiye koçberî bandorê li ser bike**

Di axaftina xwe de Roşan da zanîn ku koçberî bandor li xeyalên wê nekiriye û wiha got: "Piştî em ji cih û warên xwe koçber bûn, li Şehbayê bi cih bûn. Dema li Efrînê bûm min gelek wêneyên xwezaya Efrînê xêz dikir. Niha ez di xêzkirina wêneyan de rastiyên ku gel dijî derdixim holê. Bi koçberiyê re derfet tune bû ku amûrên wênexêziyê peyda bikim, rexmî wê jî min bi pênûsek û rûpeleke xeyalên xwe xêz dikir, min destûr neda ku koçberî bandorê li ser xeyalê min bike. Tişta ku ez nikarim bi lêv bikim bi wêneyan tînim ziman."

Her wiha Roşan bang li ciwanan kir ku ji bo xeyal û xewnên xwe têbikoşin. ***ŞEHBA***

rupel 3++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:43 Page 1



# Tecrîd veguherî îşkenceyê

Navenda Nûçeyan

**Girtiyên siyasî li dijî tecrîdê dest bi greva birçîbûnê kirin û grev dikeve meha 7’emîn. Girtî bi biryar çalakiya xwe didomînin. Dewleta tirk bi binpêkirina hiqûqê tecrîd veguherandiye îşkenceyeke bênavber û bi di îşkenceyan de israr dike**

Di,27’ê mijdara 2020’î de li girtîgehên Tirkiyê û Kurdistanê girtiyên ji doza PKK’ê û PAJK’ê bi daxwaza tecrîda li ser Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan were rakirin û zextên li ser girtî û girtîgehan bi dawî bibin dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakiya greva birçîbûnê ku bi dewirgirtina Koma 36’emîn didome. Grevê 6 meh li pey xwe hiştî û dikeve meha 7’emîn.

Her wiha bi heman armancê li Kampa Penaberan a Mexmûrê çalakiya greva birçîbûnê hatibû destpêkirin û çalakî nêzî 160 roj in didome. Çalakiya greva birçîbûnê ya penaberên ku li Kampa Yewnanistanê dane destpêkirin jî zêdetirî 140 roj in berdewam dike.

Têkildarî çalakiyên grevên birçîbûnê û polîtîkayên tecrîd û îzolasyona ku li grava Îmraliyê tê meşandin Omer Ozmenê ku 11 salan di girtîgehê de ma û gelek caran ketiye greva birçîbûnê ji rojnameya me re axivî.

**Hiqûq û qanûn tunenin**

Omer Ozmen der barê tecrîdê de da zanîn ku li Tirkiyeyê hiqûq tê binpêkirin û wiha got: “Îro ev tecrîd veguheriye îşkenceyê û bi vî awayî jî hiqûqa navneteweyî jî tê binpêkirin. Ger ku li welatekî hiqûq û qanûn tune be bizanibin ku ewlehiya jiyanê jî tune ye. Îro sedema qeyrana aboriyê ev polîtîkaya şer e. Di vê serdemê de ku gel muhtacê pariyekî nan bûye bi pêkanîna polîtîkayên şer dixwazin gel bi birçîbûnê terbiye bikin.”

**Girtîgeh pir e**

Ozmen bal kişand ser armanca çalakiya greva birçîbûnê û rola çalakgerên greva birçîbûnê û ev tişt anî ziman:“Îro li girtîgehan ji bo ku ev polîtîkayên li dijî gel bên rawestandin girtiyên azadiyê bedenên xwe kêlî bi kêlî dihelînin. Bi vî şerî dixwazin gel bi xizantî û birçîbûnê re neçar bihêlin. Ji ber vê girtî dixwazin vî şerî rawestînin. Ji ber qeyrana aborî û ji bo ku vî şerî rawestînin bedenên xwe dihelînin. Çimkî li zindanan tenê terzê çalakiyê bedena wan e. Girtîgeh di serdemên herî bi kaos de, ji bo ku riya aştiyê veke ji bo aştiya gelan dibe pir. Min jî vê jiyan kir û gelek caran tev li çalakiyên grevên birçîbûnê bûm.”

**Hemû maf tên binpêkirin**

Ozmen di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku li gel zextên li ser girtîgehan bi karantînaya koronayê re jî girtî bi tevahî hatine tecrîdkirin û wiha pê de çû: “Tu mafekî girtiyan nemaye. Faaliyetên werzîş, sohbet, atolye û hwd. hatine rakirin. Hemû aktîvite tune tên hesibandin. Niha tenê di destê girtiyan de mafê wan ê telefonê maye. Bi vî awayî berdewam bike dê ev mafê wan jî ji destê wan bê stendin. Jixwe bi hinceta cezayên dîsiplînê ev mafê wan jî tê astengkirin. Niha jî dixwazin bi qanûnekê mafê telefonê yê hemû girtiyan were rakirin. Heta radyo jî hatine komkirin. Niha têkilîyên girtiyan a bi cîhanê re li ser kanalên yekalî çêdibe. Li dijî hemû van zextan girtîyên azadiyê bi bedenên xwe li ber xwe didin.”



**Li kuçeyan deng û qêrînên dayikan**

Her wiha Ozmen da zanîn ku girtiyên ku li dijî zextan bi bedenên xwe li ber xwe didin îro jî ji bo aştiya gelan bi rola pirê radibin û axaftina xwe wiha domand:” Vê yekê di sala 2012’an de jî nîşan dan. Heta 5 salan ji çavên tu dayikan hêsir nebarî. Bi berxwedana 2019’an de jî nîşandan ku heta berxwedan pêş nekevin û bedel neyên dayîn mafên xwe bidestxistin ne hêsan û pêkan e. Vê yekê bi fedakirina bedenên xwe ispat kirin. Ez bi xwe şahîdê vê yekê bûm. Em roj bi roj diheliyan, deng û qêrînên dayikan li kuçê û kolanan olan dida. Ew rojên ku me pişt dida pişta hev û sonda berxwedanê dixwar ji ber çavên min naçin. Deng bidin zindanan da ku aramiya hevpar a gelan pêk were.”

Ozmen herî dawî anî ziman ku bîranînên wan ên biwate yên wê demê hîn jî wekî duh li ber çavên wî ne û ev tişt bi lêv kir: “Rojekê me li baxçe volte diavêt. Li qoxûşê agahiyek belav bû. Di nûçeyan de hat ragihandin ku deriyê Îmraliyê vebûye û hevdîtin pêk hatiye. Coş û kelecanek pir mezin li ser me serwer bû. Tam di wê kêliyê de min ew hestê ji bo aşitî û aramiya gelan bedel dayîn û vê têkoşînê bi serkeftinê tacîdarkirinê jiyam.”

# Doza Kobanê bi parastinan dewam kir

Danişîna 2’yemîn a Doza Kobanê ku rêveberên HDP’ê jî di nav de 28 jê girtî 108 siyasetmedarên ji siyaseta kurd tên darizandin hefteya borî berdewam kir. Danişîn li 22’yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê ku li Kampûsa Girtîgeha Sîncanê ye hat lidarxistin.

Pisporên Delegasyona Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewropayê (YE) û nûnerên dîplomatîk ên welatên Yekîtiya Ewropayê doz şopandin. Şandeyek qelebalix a HDP’ê jî dozê dişopîne û bi sedan parêzer di danişînê de amade bûn.

Beriya ku doz dest pê bike hevserokê HDP’ê Mîthat Sancar diyar kir ku Doza Kobanê dozeke komployê ye ku desthilata siyasî bi armanca tolhildanê amade kiriye û wiha got: “Em ê li eywana dadgehê û li her qada siyaseta demokratîk berdewam bikin ku heqîqetan deynin holê.”



Danîşîna Doza Kobanê 3 rojan dewam kir. Hevserokê HDP’ê yê berê Selahattîn Demîrtaş di roja ewil a danîşînê de di parastina xwe de destnîşan kir ku şandeya dadgehê di Doza Kobanê de ji bo biryara DMME’yê li dij bikar bîne di wergerê de sextekarî kiriye û got: “Erdogan, Bahçelî û Soylû li ser qoltixên dadger in. Li ser qoltixê dozger jî medyaya alîgir û artêşa trolan rûniştiye.” Demîrtaş di dewama parastina xwe de got: “Dozger bi rêyên dijyasayî ji ANF’ê ya ku li Tirkiyê qedexe ye, nivîs girtine. Hat teqezkirin ku şandeya dadgehê ji bo hikum li ser me deyne hatiye wezîfedarkirin.”

Di Danîşîna 2’yemîn de parlamentera HDP’ê ya bere Ayla Akat Ata axivî û beriya ku parastinê bike got ku ji ber polîtîkayên bişaftinê bi dimilkî perwerdehî neditiye, nikare bi kurdî parastina xwe bike û lêborîn ji hemû gelê kurd xwest. Ayla Akat Ata diyar kir ku bi Doza Kobanê hewl tê dayîn ku kesên cihêkarî li wan tê kirin, tune tên hesibandin, kesên nakevin parlamentoyê, gotina xwe nabêjin bên darizandin û ev tişt got: “Ev dosya ew dosya ye ku em ê pê tariyê ronî bikin.”

Her wiha siyasetmedara kurd Gultan Kişanak di Danîşîna 2’yemîn de parastin kir û wiha got: “Ez kurd im û jineke kurd im. Ji bo min li navên nû negerin. Her kes li gorî hesabê xwe min dikin ‘cudakar’ û ‘terorîst.’ Rastiyên di dîrokê de wê ronî bibin. Ji bo ku hûn xwe ji vê şermê xelas bikin, em şansekê didin we.”

Di danîşîna roja înê de danişînê bi ravekirina hincetên daxwazên reda dadgerî ya parêzeran dest pê kir. Parêzer Cemîle Turhalli Balsak di danişînê de wiha got: “Em dixwazin ji ber daxuyaniyên miwekîlên me yên der barê daxwaza reda dadgerî de şandeya dadgehê ji dozê vekişe. Heke hûn venekişin, em dixwazin dosye ji bo dadgehek bilindtir were şandin.” ***ENQERE***

# Simbil hişk bûn, cotkar deyndar in

Li herêmê cotkar ji ber ziwabûnê û zêdebûna mesrefan, ketine halekî wisa ku hema bibêje nikarin erdên xwe bajon. Yek ji herêmên ku nesîbê xwe ji ziwabûnê girtiye jî Taxa Qebeseqeliyê ya Sûra Amedê ye. Cotkar Azîz Çinar ku 30 sal in li taxê çandiniyê dike, anî ziman ku ji ber ziwabûnê îsal tu tişt bi dest wan neketiye.

Azîz Çinar bi lêv kir ku ji ber ku di meha nîsanê de baran nebariyaye, hema bibêje hemû simbilên wan hişk bûne û got: "3 sal in ji ber ziwabûnê genimên me simbil nagirin. Berê em di nav van erdan de winda dibûn. Lê niha vikîvala ne. Her tişt hişk bûye. Ji ber ziwabûnê genim qam neavêtiye. Simbil bê xêr bûne. Berê me serê donimê 2 ton genim werdigirt, lê niha bi zorê ton û nîv jê tê. Jixwe ew jî têra mesrefê xwe nake."

Çinar bal kişand ser sozên ku hatine dayîn û wiha got: "Qaşo dê destek bidana. Na hêvî nema. Tu sozek xwe jî bi cih naynin. Êdî em jî doza tiştekî nakin. Çimkî bajon jî badilhewa ye, dewlet xwe nade tu tiştî jî. Cotkarî nemaye, miriye. Niha dahat û mesref bi zorê hev derdixin. Her kes xisiriye."

Welatiyê bi navê Yilmaz Çinar jî bi lêv kir ku cara ewil e ziwabûnek wisa dîtine. Çinar ku sewalvaniyê dike, anî ziman ku berê qet nebûna tiştek di dest wan de dima, lê niha ji ber ku her tişt biha bûye tiştek jî di dest wan de namîne.

Serokê Odeya Endezyarên Çandiniyê (ZMO) a Amedê Abdûssamed Ûcaman jî da zanîn ku li seranserê Amedê niha nêzî 600 hezar donim nîsk, milyonek donim ceh û 3 milyon donim jî genim hatiye çandin, lê ziwabûnê pişta cotkaran şikandiye. ***AMED***

# Dev ji pêkanîna edaletê bernadin

Malbata Şenyaşar a ku sê ferdên mala wan di êrîşa AKP’yiyan de jiyana xwe ji dest dan û ferdek wan girtî ye, bi daxwaza “edaletê” nobet da destpêkirin nêzî 80 roj in berdewam dike. Emîne û Ferît Şenyaşar ku li ber Edliyeya Rihayê hatibûn binçavkirin û hatibûn berdan carek din berê xwe dan ber edliyeyê.

Malbata Şenyaşar li ser hesabê xwe yê Twitterê ev peyam parve kir: “Ev mertalên ku tên rakirin, bi armanca astengkirina daxwaza me ya EDALET’ê ye. Tevî hemû mudaxileyan, binçavkirinan jî em li ber Edliyeya Rihayê ne. Em ê bêdeng nebin, dev jê bernedin û li ber xwe bidin.” ***RIHA***



rupel 4++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:42 Page 1



## QADA ONLINE DERFETEKE BAŞ E JI BO ZIMANÊ KURDÎ

# Pirek di navbera helbestkaran de ava bû

Emîn Aksu

*Di van demên dawî de bi taybetî jî ji ber şert û mercên pandemiya covîdê piraniya kar û xebatên civakî, edebî û aborî êdî li ser platformên dîjîtal tên kirin. Her wiha em zanin gelek sazî û dezgehên ziman û edebiyata kurdî jî vê qada online baş bi kar tînin û heta niha gelek program û proje jî di vê qadê de didomin. Me jî xwest di vê hevpeyvînê de balê bikişînin ser kar û barên Komxebata Helbestê û em bi Koordînasyona Rêveber re axivîn.*

**Hûn yek ji damezrînerên vê komxebatê ne û di heman demê de yek ji xebatkarên koordînasyona vê komê ne, gelo fikra vê "Komxebata Helbestê" çawa derket holê û hûn dikarin behsa wê pêvajoya despêkê bikin?**

**Bersiva Azad Zal:** Berî her tiştî bo vê komxebatê bi van hevalan re dimeşînim bextewar û serbilind im. A rast fikra vê komxebatê ne ayîdî min tenê ye, lê piştî fikreke weha derket holê hem Komeleya Wêjekarên Kurd hem jî Komeleya Nivîskarên Mezopotamyayê piştgirî dan vê xebatê û piştre jî me ev proje ji ser Kamran Simo Hedilî re bi Enstîtuya Kurdî Ya Stokholmê re jî parve kir û wan jî ev pêşniyaz pejirandin. Di dawiyê de jî di pêşengiya van her sê saziyan de komxebatê dest pê kir. Berî ku komxebat dest pê bike, em wekî koordînasyon, me di nava xwe da ahengek ava kir û karbeşiya xwe kir. Mamoste Kamran Simo Hedilî hem birêvebirina giştî û hem jî ew ê rêzesemîneran bidana, Gulîstan Kanîreş û Nurcan Delil ew ê hêsankarî û moderatoriyê bikirana, Azad Zal û Emin Aksu ew ê berpirsiyariya birêvebirina teknîkî û ahenga torê bimeşandana. Bi vî awayî me dest bi xebata xwe kir.

**Her weha hûn jî yek ji damezrîner û endamê kordînasyona komxebata helbestê ne, gelo heta niha her tişt wekî plansaziya we didome an we bi demê re hin mijar û bûyerên din dan pêşiya xwe?**

**Bersiva Nurcan Delîl:** Belê dema me biryar da ji bo kargeha komxebatê di navê de me plansazî jî dabû pêşiya xwe. Em her tim di nav pêwendiyê de bûn, cara yekemîn bû komxebateke helbestê dihate kirin, ji bo wê jî divê plansaziyeke baş hebûya, em bi kelecan û kêfxweş bûn. Bi vê fikrê hevalên beşdar jî gelek kêfxweş bûn. Dema me dest bi komxebata kargehê kir tevlibûnek baş çêbû. Piştî semînerên komxebatê di dawiyê de koordinasyona me bo bernemayê pêşiyê dicive û haziriyê dike û dîsa berî destpêkirina semînerê jî em koordînasyon, berî komê dicivin û heke hebin pirsgirêkên teknîkî çareser dikin, ango em hinekî bi disîplîn tevdigerin, lewma civînên me serkeftî û li gorî plansaziya me didomin.

**Mamoste hûn jî hem wekî Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê û hem jî wekî kedkarekî yê Koordîna komxebatê û di heman demê de jî axfatvanê semînerên vê komê yî; gelo berî niha jî komxebatên weha hatibûn kirin an na û armanca we ya beşdarbûna vê komxebatê çi bû?**


**Bersiva Kamran Simo Hedilî:** Ewilî spas bo derfeta vê hevpeyvînê. Li ser pirsa te dikarim vê bêjim bi rastî min bi xwe di komxebata bi vî rengî de cih negirtî bû û bi qasî dizanim nehatiye kirin jî heke hatibe kirin jî hayê me jê çênebû ye. Her çendî berî niha komxebatên bi mijarên din ve eleqedar hatibin kirin jî lê belê ne wekî vê bi awayekî sîstematîk û bi rêkûpêk û her hefte semînerek li ser mijareke cuda me nekiribû. Bi rastî hevalên vê Koordîna komxebatê xebateke baş û kedeke mezin didin û ev ked û xebat herikbariya komxebatê bo min jî hêsantir dike.

**Belê hûn hem wekî endamê kordînasyonê û hem jî wekî Moderasyona vê komxebatê dikarin hinekî behsa tevlîbûna beşdaran û danûstandinên xwe bikin û heke hebin zor zehmetiyên hûn dikişînin çi ne ?**

**Bersiva Gulistan Kanîreş:** Bi rastî vê komxebatê hem wekî jineke kurd û hem jî wekî helbesthezekê kêfxweşiyek mezin da min jî. Lê vê bêjim, piştî me dest bi semînerên xwe kirin û hinekî jî berbelav bû carinan rojê bi dehan kesî reme têkilî datînî. Ev yek her çendî zehmet be jî lê şanazî bû bo me. Wekî tê zanîn hevdîtina xwe ya ewil me ji bo hevnasînê veqatand. Lê piştî semîneran dest pê kir û babetên bi helbestê ve têkildar hatin nîqaşkirin, me dît jina kurd di qada edebiyatê de jî xwedî vîn û hêzeke girîng e. Ev jî dikarim bêjim cihê şanaziyê ye bo me.

**Bi qasî em dizanin va ye nêzîkî du mehan e karê vê komxebatê didome, gelo bi komxebatê armanc û hedefa we çi bû an jî hûn heta niha çiqasî nêzîkî daxwaz û hedefa xwe bûne?**

**Bersiva Azad Zal:** Ewilî wekî Azad Zal vê bêjim di roja me ya îro de pêşketina teknîk û teknolojiyê dinya bi qasî tikandinekê biçûk kiriye. Ango berovajî demên bihorî teknolojiyê ew mesafe di navbera me de nehiştî ye. Me jî xwest em van derfetan bi kar bînin û bi vê yekê hem helbestvanên ku bi kurdî dinivîsin, bi kurdî difikirin bêhtir hevûdin nas bikin û hem helbesta kurdî hem jî ya dinyayê bêhtir nas bikin; bi hev re wî cewherê helbesbest û helbestvaniyê kişf bikin.Yek jê daxwaza me ew e; ew kesên di helbestê de pêş ketine û ked dane helbestê, em ji zanîn û fikrên wan jî sûd werbigirin. Vê Komxebatê helbesthezên kurd yên li welatên cuda dijîn anîn ba hev û bû sebeba têkiliyeke xurt di nava wan de.



Ev Komxebata hanê yê çiqasî derî li ber beşdaran veke, yê çiqasî pêşengiya vê yekê bike ew giring e, heta niha li gor fikra min ev Komxebat di vî warî de baş tê meşandin. Lewma ev Komxebat bi awayekî civakî bûye qadeke perwerdehiyê

**Di vê komxebatê te mîsyonek çawa derdikeve holê, an jî mîsyona vê komxebatê hûn dikarin çawa vebêjin?**

**Bersiva Nurcan Delîl:** Mîsyon bi taybetî di afirandina nasnameyan de xwedî cihekî girîng e. Mîsyona me ya derketiye holê ya herî giring ew e ku em ê bikaribin xwe bigihînin hemû nivîskarên xizmeta zimanê xwe dikin û em ê hewl bidin pirekê ava bikin ku wan bigihînin hevûdu û fikir û ramanên nivîskaran, dîroka kurdan û çanda zimanê kurdî vejînîn û bi pênûsa wan mîraseke kurdewar bihêlin ji nifşên nû re. Ji bo wê jî em ê hewl bidin kar û xebatên weha bidomînin. Bihevrebûn serxwebûn û xurtbûnê tîne.

**Mamoste em dixwazin hûn hinekî babetên helbestê yên hûn di semîneran de li ser dişêwirin bikin. Wekî serenav hûn dikarin behsa mijarên semînerên jî xwe bikin?**

**Bersiva Kamran Simo Hedilî:** Em li gorî plansaziya xwe her hefteyê mijarekê diyar dikin û li ser wê mijarê semînera xwe didin. Bingeha mijarên em dikin jî em ji pirtûka bi sernav "Helbest Çi Ye" hildibijêrin. Wê pirtûkê deh dozdeh hêmanên helbestê esas girtine bi hûrgilî ev babet vegotine. Heta niha mijarên wekî; helbest û rola wê di pêşxistina civakê de, helbest û ziman, helbest û îlham, helbest û hişyariya hevpar û hestên azadiyê, di helbestê de sembol, sembolîzm û helbest û felsefe, me di semînerên xwe de pêşkêş kirine. Vê jî bêjim bi qasî dibînim eleqeyeke baş jî ji beşdaran heye. Ev eleqe dibe sedem pirî caran zemanê me têra pirs û şîroveyên tên kirin nake û em dema semînera ji mecbûrî dirêj dikin.

**Piştî xebatên komxebatê des pê kir hûn di qada helbestê de rastî bertekên erênî-neyînî hatin an jî rexne di vê mijarê de li we hatin kirin?**

**Bersiva Gulistan Kanîreş:** Belê di mijarê de navnîşanên me yên elektronîk di komê de hatine parve kirin û em ji hemû fikr û nêrînên hevalên xwe re vekirî ne. Ji rexneyan bêhtir dikarim bêjim bo herikbariya komê pêşniyaz û nêrînên cuda tên û em jî wekî koordînasyona komxebatê van pêşniyazan dinirxînin. Pirî caran em li gor mijara wê hevdîtinê jî van pêşniyazan bi kar tînin.Li gorî tesbîta me hevalên me yên beşdarî vê komxebatê dibin hemû jî bi projeyê gelek kêfxweş in.

**Vê pirsê hem wekî Azad Zal û hem jî wekî endamê kordînasyonê vê komxebatê dixwazim ji bipirsim. Bi we ev komxebata an jî Komxebatên weha hûnerî rêyeke çawa li ber hûnerhez an jî edebiyathezan vedike?**

**Bersiva Azad Zal:** Komxebata me ya em niha dimeşînin, kesên ku xwe li helbestê qewimandine, xwestine helbestê binivîsînin û an jî dinivîsin û dixwazin helbesta xwe xurt bikin, ev komxebata hanê yê çiqasî derî li ber wan veke, yê çiqasî pêşengiya vê yekê bike ew giring e. Heta niha li gor fikra min ev komxebat di vî warî de baş tê meşandin. Lewma ev komxebat bi awayekî civakî bû qada perwerdehiyê. Wekî din jî wateya komxebatê ne ew e yek tenê derkeve ser ekranê û ders bide an jî biaxive, helbet yê kesek pêşkêşiyê bike û mijarê diyar bike û ragihîne lê wateya Komxebatê ew e hemû beşdarên komê bi fikr û ramanên xwe aktîf beşdarî gotin û vegotinê bibin.

**Hûn ê komxebatê kengê û bi çi awayî biqedînin?**

**Bersiva Nurcan Delîl:** Komxebata helbestê; ew ê bi şevbihêrkeke şahiyê bê lidarxistin û di vê şevê de helbest yê bên xwendin û wekî mêvan yê çend stranbêj jî bi stranên xwe tev li şahiya me bibin, di heman demê de me di nava koma xwe de pêşbirkeke helbestê jî organîze kiriye û dê di dawiyê de encama vê pêşbirkê jî bê eşkerekirin.

**Komxebatên bi vî rengî bandoreke çawa li yê li helbestê an jî li helbesthezên kurdî bike, yê çi li zimên an jî li helbestê zêde bike, ev komxebatên hanê, an jî bi we komxebatên weha yê bandorekê çêbike an na?**

**Bersiva Kamran Simo Hedilî:** Bi sedî sed yê bandorekê çêbike, heke wekî axaftvan û koordînasyon bandorê li me dike ez bawerim li hevalên beşdar dibin jî dike. Vêca heke em li dinyayê jî mêze bikin (yên wekî klasîkên dinyayê tên hesibandin û hîn em dixwînin) em ê bibînin exlebê helbestvanên wan yan li dora kovarekê, yan jî dora weşanxayekê, an jî di bin sîwaneke din de li hev kom bûne û li ser babetên helbestê munaqeşe kirine. Ya me jî ez bawerim yê bi vî awayî pêş bikeve. Her çendî helbestvaniya me ya takekesî kevin be jî lê helbestvaniya kolektîf hîn nû ye. Di nav koma helbestvanan de helbest xwendin û nirxandin hîn nû pêş dikeve di nava me de. Min zêde li ser lêkolîn nekiriye lê ez bawer im di vî warî de jî koma me belkî yekemîn e. Ango em her hefte 40-50 kesên bi helbestê ve mijûl, tên cem hev û li ser mijareke helbestê bi hev re minaqeşe dikin.

Wekî mînak civîna me ya borî mijara me helbest û felsefe bû. Di wê civînê de me behsa ferqa di navbera feylesof û helbestvan de kir, me behsa ferqa di navbera zimanê helbestê û zimanê felsefeyê de kir, me behsa rola helbestê ya di felsefeyê de, ya felsefeyê di helbestê de kir. Dixwazim vê bêjim vêca dema 40-50 kes serê xwe bi mijarê ve biêşînin ne mimkun e mirov jê sûd wernegirin û bandor nebin. Ji ber ku her yek ji me di pencereyeke cuda re li jiyanê mêze dike.

## Komxebata Helbestê

Komxebata Helbestê bi pêşengiya Komeleya Wêjekarên Kurd, Komeleya Nivîskarên Mezopotamyayê û Enstîtuya Kurdî Ya Stokholmê dest pê kir. Mamoste Kamran Simo Hedilî hem birêvebirina giştî dike hem jî rêzesimîneran dide. Gulîstan Kanîreş û Nurcan Delîl hêsankarî û moderatoriyê dikin, Azad Zal û Emîn Aksu berpirsiyariya birêvebirina teknîkî û ahenga torê dimeşînin.

rupel 5++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:42 Page 1





Sîdar Jîr

# Çîrokên bê navend û bindestiya serdest(!)

Di hunerê de hin berhem hene ku mirov gelekî aciz dikin. Wekî mînak jî ev berhem gelek in… Ev acizî di edebiyatê de ji bo demeke dirêj, bêhtir mirov aciz dike. Objeya sereke ya edebiyatê mirov e, xweza ye û hwd… Loma jî heqîqet e. Ji ber ku bi awayekî ji awayan heqîqet e, heqîqet jî pirî caran mirov aciz dike. Nivîskar bi çi şêwazê vebêje hîç ne xem e lê xwendevan wê berhemê li gorî "rastiya xwe" dixwînin û şîrove dikin û acizî jî wekî mafê wan e êdî. Belkî jî nivîskar rê li ber dayina vî mafî vedike…

Edebiyat ne mecbûr e her dem tiştên li gorî dilê me bike mijar û vebêje, gelek caran divê berovajiyê vê xweşiya dilê mirov, divê acizî û bêhizûriyê bike mijar. Ev jî xwedî cihekî girîng e di qada edebiyatê de.

Romana Îrfan Amîda ya dawîn DERÎ VEKIRÎ BIHÊLIN WÊ HECHECÎK VEGERIN di dawiya sala 2020'î de çap bû; metneke bi wî rengî ye di her kêlî, her çîrok û her bûyerê de xwendevan aciz dike. Ev acizî ji heqîqeta jiyanê tê û nivîskar di wir de bi hevsengiyeke gelekî hostane roman honandiye. Ji ber di romaneke tijî têgih de, di nava tenêtî, bêkesî, bêçarebûn û çîrokên bi ser çîrokeke din ve girêdayî gelekî zehmet e nivîskar bi van têgihan mirov aciz bike. Ji ber ku bi hostetî neyê honandin, êdî çîrokên maxdûriyetê dertên pêşberî xwendevan. Di vê romanê de xwendevan hest bi maxdûriyetê nake lê aciziyeke dertê holê. Ew acizî jî ji xurtiya pênûs û hunerê ye ku dikare xwendevên aciz bike: Huner e…

Îrfam Amîda di romanê de çîrokên xwe bi karakterên wekî Nesîma, Zerga, Şîlan, Hêlîn,Mazlûm, Zerîfa, Sozdar, Xalê Osman û çendekên din bi ruh kiriye. Ev karakter temsîlî dibin qehremanên şerekî û xwendevan çavgirtî dibe qada aciziyê. Xwendevan dibe qada şer. Şer e, şerekî şervan jî jê re ne amade ne(!) Xalê Osman çîrok û formulasyona çûn û vegerê ye.

Nivîskar bi awayekî gelekî zîrek, bi dan û standina Xalê Osman û Şervan a li paş deriyên ku taliyê ji bo serdemekê tê girtin de nîqaş û minaqeşeya hebûn û serkeftinê re, bi Zerîfayê, bi hesta jîne Kurdî şîfreyên serkeftinê dide vegotin. Roman her ku diçe li hev digere û gerînek zêdetir dibin.

Romana Îrfan Amîda, Derî Vekirî Bihêlin Wê Hechecîk Vegerin û ya Tim O'Brien a bi navê "The Things They Carried(Tiştên Ew Hildigirin(!))" gelekî dişibin hevûdu. Di jêrzemîn û dengên hundirîn û bingehîn de dengê helîkopter, şer û mîtralyozan e… Xwendevan xwe di nava şer de hîs dikin. Di vê atmosferê de şer êdî dibe seansên rojane yên jiyana asayî. Îrfan Amîda di romanê de çîrokên jiyana wan kesên di romanê de, bi çîrokeke din dewam kiriye; ya rastî bi çîrokeke din nixumandiye û çîroka nû jî ji bo em/xwendevan lê zêde bikin nîvco dihêle. Her cara ku xwendevan çavên xwe vedikin, deng belav bûbe jî toz û xumama şer xwe bi mijangên xwendevên ve digire û êdî xwendevan nikare xwe ji atmosfera şerê nîvcomayî dûr bixe. Ji ber xwendevan her çiqas bixwazin ber bi kakil û navenda çîrokeke di romanê de biçe jî hêzeke manyetîk a giştî ya romanê û çîrokên bi ser hev ve nahêle xwendevan nêzî navendê bibe û xwendevan ji dûr ve, ji qeraxa çîrokan ve tenê dibe temaşevan. Lê di temaşekirina wan çîrok, bûyer û karakteran de, xwendevan têdigihîje ka ew ji kîjan mekan û zemanî hatiye û wê kêlîkê li pêşberî rista xwe pêk tîne. Hemû şax û bendên di romanê de ku wekî çîrokên bi ser hev ve digihîjin xwendevên bi êş, bêçaretî, bêkesî, têkçûn, xwîn û girîna xwe êdî çîrokeke serdest a civakê ye. Ji bo vê serdestîyê bi londeran hevok hene di romanê de, mînakek jê ev e: "Lê dengê wê, ligel sistiyê jî tîna dengê wê li xwe neşikenand. (r.151)" Dema hemû çîrok û qewimînên romanê dikevin ser hev, tu tiştekî li xwebûna xwe naşikîne.

Îrfan Amîda di romana xwe de, bicihkirina çîrokên bênavend esil di nava hewldanê de ye ku derbê li çîroka esasî bixe. Dema ku derb li çîroka esasî bikeve wê demê wê çîrok dest pê bike. Lê ew derb jî ji xwendevanan re hiştiye.

Di romana Îrfan Amîda de, mekan, obje, deng, ba, şev, reng û hemû tişt wekî metaforîk di nava valahiyekê de bi zemên re zindî bûne. Temsîliyeta wan têgihan û aciziya mirov di çarçoveyeke hunerî de, bi awayekî ji manewiyatê wêdetir rastî û xeyalê digihîne hev.

Piştî xwendineke bihûrgilî, romannûs bi tu awayî nikare midaxaleyî îmaja xwendevan bike. Xwendevan ji derveyî metnê çîrokên di romanê de digihînin hev û heger xwendevan zêde kûr bajo bi rehetî valahiya çîrokan bi xwe jî dadigire.

Di bêçaretî, bêkesî, tenêtî, valahî û hemû çîrokên nîvcomayî de Sofî Kîsik bêhna aîdiyet û xwedîtî/mulkiyetê tîne bîra mirov.

Di romana Derî Vekirî Bihêlin Wê Hechecîk Vegerin de tenê ew îhtimal heye ku xwendevanên mîna min dûrî helbestê dê jê aciz bibin, ew jî ev e; Vegotina bi hevokên şikestî(!) (Heger di vê xalê de ez jî ne wekî Sofî Kîsik heynik bim!)

Piştî xwendina romanê, ya di binhişê mirov de dimîne; dengê tang û top û mîtralyoz û helîkopteran e ku êrîşî ruhê madî û manewî yê mirov dike. Sînorên madî li bin guhê hev dixe. Gotinê Zerîf rê dide mirov bide pey rêyeke dîtir: "Çîroka agir lê nabihure her di xwe de dişewite.(r.213)" Û derî ji bo demekê û ji bo hinekan tê girtin. Îrfan Amîda mifteya derî êdî dide mista me xwendevanan…

Derî Vekirî Bihêlin Wê Hechecîk Vegerin, Îrfan Amîda, Roman, 216 rp. Weşanên Lîsê, 2020




# Çûyînên ebedî yên bê wext û dem!

Harûn Hêvîdar

Çavê min li rê man..

Bêyî xatir bixwazî û bêyî hembêzkirin nekevin ser rê…

lê nehatî, çavên min li rê qerimîn û nehatî…

Ne bayê bêhna te, ne jî qasidan xeberek ji te gihand min,

hema wisa bêdeng û pêjnî winda bû û çû…

Bê ku şop û nîşaneyek li dû xwe bihêlî, da bidim dû te…

Ji we tenê ez û bîranîn mane… ew min li ser lingan dihêlin…

Dizanim hûn ê neyên lê dîsa jî wê çavê min tim li rêya we be…

Çûyînê îro ez pir êşandim. Mîna bazekî şikestî, bihareke bê gul, robarekî bêzinar, dayikeke zaroklêwindabûyî, di halê xwe de dikale û dinale.

Gelo hemû çûyîn jî wiha bi mirov dike?

Ev êş dişibe êşeke welê ku evîndarek ji evîna xwe qût bûye, dişibe hewara dayikeke li ser zarokên xwe dinale, çavlirêbûneke hevrêyê xwe ye û bihareke li benda kulîlk û zozanên xwe ye. Niha çi bêjim jî nikarim vê êşê pênase bikim û vebêjim. Di hal û rewşa xwe de dihelim û dikalim. Ma ji bo çûyînek nelibendê mirov ewqasî çok dide erdê? Gelek hevrêyên min hatin xatir xwestin û çûn. Li bendê bûm ku hemû jî rojekê vegerin. Lê hemû jî çûn nehatin!

Êdî ne dikarim mîna pêxember Eyûb sebrê bikêşim, ne jî çavê min êdî li rêyan dimîne. Çav westiyan, dil westiya, ling westiyan û em jî hew dikarin xwe li vê ragirin. Kevirê sebrê jî hew xwe radigire û şikest.

Boxçik û çenteyê bîranînên li gel min tije bûn, ez hew dikarim vî barî rakim. Ne milê min xwe li ber vê digire û ne jî dilê min. Êşa çûyînê li aliyekê, bîranînên wan êdî min diêşînin. Ne dikarim rakevim ne dikarim bijîm. Mîna tabloyekê her tim li ber çavê min zindî ne, bi min re dijîn. Lê mîna xeyalekê û sêhrekê ne. Nikarim wan bigirim, nikarim hembêz bikim.

Şevên dirêj û tarî dibin mêvan û li esmanan diçirisin. Ji dûr ve lê dinêrim û yek bi yek xêrhatina wan dikim. Ew jî bi çirûskên ji rûyên wan diçin, silav li min dikin û min hembêz dikim. Dixwazim xwe bigihînim wan, lê dikim nakim nikarim. Bi vî rengî em li xwe dikin sibeh. Dizanim çûn û nema tên, lê bi hatin û careke din himêzkirina wan dilê xwe dixapînim. Zanim nayê, lê çi bikim, nexwe nikarim vî dilî aş bikim. Ji ber ku ev dil bikeve, wê hemû bîranînên wan bikeve ser vê rûyê erdê ku hê ji postalên qirêj ên dagirkeran paqij nebûye. Ji ber wê ewqasî xwe radigim. Nexwe ev beden wê nikaribe vê êşê ragire.



Vê sibehê çûyînek din a bêxatir jî rûyê min ramûsa û çû… ewqas bi êş bûn ku çavê min jî rondik nebarandin. Di halê xwe de cemidîm. Di kêliyekê de hemû bîranîn û serborî li ber çavê min mîna şerîteke fîlman hat û borî. Dixwazim biqîrim, bikim hewar lê deng dernakeve. Dixwazim pey şopa wan bimeşim, şop li min winda dibin. Dibezim û dibezim nagihêm wan, tim li ber çavên min dixuyên û winda dibin.

Geh li çiyayan wan dibînim, geh li bajar û geh li zozanan; mîna roja ewil ciwan û bedew in. Rûyên wan dikene û diçirisin.

Nizanim heta kengê ez ê yeko yeko wilo xwe li çûyînên bêwext û bêdem bigirim. Kengê wê dor bê ser min, ez ê kengê xwe bigihînim wan jî nediyar e. Tirsa gelo ez bikevim ser rêya çûyînê jî ez ê wan bibînim xwe li dilê min dide der! Em ê li cihekî çawa û di kîjan şertan de hev bibînin û hembêz bikin? Lê tiştekî baş dizanim ku me tevan bêriya hev kiriye. Em hemû jî li benda wê rojê ne…!

rupel 6+++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:40 Page 1



# 'Tirkiye heta qirikê di nav aloziyê de ye'

Navenda Nûçeyan

**Rêveberê Saziya Kurd Bê Sînor Qadar Pîrî têkildarî operasyonê dersînor a Tirkiyeyê axivî û destnîşan kir ku Tirkiye her dema di hundir de winda dike bi êrîşan berê xwe dide kurdan**

Operasyona dersînor a Tirkiyeyê ji 23'ê nîsanê ve, bi piştgiriya dewletên navneteweyî û PDK'ê didome. Tirkiye her ku di şer de bin dikeve berê xwe dide çekên kîmyewî û hem hiqûqa şer hem jî mafên mirovan bin pê dike. Binkeftina xwe ya di operasyonê de bi vîdeoyên têkiliyên mafya-dewletê jî nikare binax bike.

Têkildarî operasyona Tirkiyeyê ya dersînor û bêdengiya PDK'ê me bi rêveberê saziya Kurd Bê Sînor (Kurdes Sans Frontieres) Qadar Pîrî axivî.

Qadar Pîrî têkildarî operasyona Tirkiyeyê de diyar kir ku Tirkiye her çiqas bêje ew tenê êrîşê PKK'ê dike rastiya vê yekê ne ev e û wiha got: "Tirkiye êrîşî hemû kurdan dike. Sîstem û mêjî, aqil, polîtîkayên dewleta tirk li ser tunekirina kurdan e. Hewce ye em vê yekê qet ji bîr nekin."

**'Ferq di navbera wan de tune ye'**

Pîrî axaftina xwe de bal kişand ser bikaranîna çekên kîmyewî ku Tirkiye di operasyonan de bikar tîne û ev tişt anî ziman: "Berê dewleta Iraqê Seddam Huseyîn bi kîmyasalê xwest gelê kurd tune bike. Di roja me ya îro de Tirkiye dixwaze kurdan tune bike. Me ev yek li rojava û li başûrê Kurdistanê jî dît ku dewleta tirk çawa ji fosforê heta gelek çekên kîmyewî yên din bikar anîn. Tişta ku îro dike jî hemû mafên mirovan bin pê dike û bi çekên kîmyewî êrîşên xwe didomîne. Van êrîşên xwe jî bi mijara Filistînê binax dike. Ferqa di navbera dewleta Israîl û Tirkiyeyê de tune ye."

**'Her tim berê xwe dide şer'**

Siyasetmedar Pîrî da zanîn ku Tirkiye li hundir nikare pirsgirêkên xwe çareser bike û bi vî awayî berê xwe dide şer û wiha axivî: "Îro Tirkiye ji ber pirsgirêkên xwe yên siyasî, aborî, dîplomasî û hwd. di asta herî jor de, heta qirêkê di nav aloziyê de ye. Ji ber ku li hundir nikare pirsgirêkên xwe çareser bike berê xwe dide polîtîkayên derve û bi vî awayî êrîşî her derê dike. Mînak dema li



Rojava şer sar dibe an jî dewlet nahêlin ku Tirkiye êrîş bike, wê demê êrîşî axa başûrê Kurdistanê dike. Beriya wê berê xwe dabû Libyayê, Ermenistanê… Yanî îro Tirkiye bêyî şer nikare hebûna xwe bidomîne."

**'Ji bo Kurdistanê li ber xwe didin'**

Qadar Pîrî ragihand ku êrîşên Tirkiyeyê li ser du xalan pêk tên û wiha pê de çû: "Yek jê dixwaze pirsgirêkên xwe yên navxweyî û giran bi meseleyên derve re bidin jibîrkirin. Ya duyemîn; dixwaze xewn û xeyala xwe ya osmaniya nû ava bikin û vê yekê ji pir bi aşkera dikin. Ji ber vê yekê jî van êrîşên bi vî rengî li Başûr û li tevahiya Kurdistanê dike. Lê mixabin hê jî hikûmeta başûrê Kurdistanê naxwaze vê yekê bibîne û li hemberî dewleta tirk xwe bêdeng dihêle. Lê hewce ye hikûmeta Başûr vê yekê baş bizanibe ku li dijî dewleta tirk, PKK ne tenê ji bo xwe ji bo, başûr, ji bo rojava û ji bo tevahiyê Kurdistanê li ber xwe dide. Tenê daxuyaniyeke hikûmeta başûr têr nake, divê bi her awayî bibe alîkar PKK'ê re. Ji bo ku PKK li hemberî dagirkeriya Tirkiyeyê deskeftiyên hikûmeta başûr jî diparêze.

Her wiha îro li ser axa başûr tenê ji 16'an zêdetir kampên dewleta tirk hene. Tirkiye dixwaze hejmara kampên xwe li ser axa Başûr zêdetir bike. Çeteyên ku li Libya, Sûriye, Ermenistanê bi kar anîn dixwaze li ser axa Başûr jî bi kar bîne. Bi van çeteyan Tirkiye ji du aliyan jê feyde digire yek jê hem xeyala xwe ya osmaniya nû tîne cih, hem jî ev çeteyên ku niha vala mane li ser axa başûr wan ji bo berjewendiyên xwe bikar bîne."

**Bêdengiya hêzên navneteweyî**

Pîrî têkildarî nûçeya Mornîng Starê jî diyar kir ku her çiqas bi vî awayî carinan nûçeyên wisa derkevin jî di rastiya xwe de hêzên navneteweyî jî li hember kiryarên Tirkiyeyê yên mafên mirovan bin pê dikin bê deng in û wiha domand: "Bêdengiya van dewletan jî ji têkiliyên aborî yên di navbera van dewletan û Tirkiyeyê tê. Tirkiye bi zanebûn bi dewletên navneteweî re dikeve nav têkiliyên danûstandinê. Tirkiye ji bo xwe ji van sûcên wek bikaranîna çekên kîmyewî vekişîne dikare her tiştî bikire û bifiroşe dewletên navneteweyî, dikare siyaseta xwe jî bifiroşe. Jixwe ji ber ku Tirkiye di şer de bin dikeve çekên kîmyewî bi kar tîne."

**Li gor berjewendiyan tev digerin**

Her wiha Pîrî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Helbet hewceye em ji bîr nekin ku bêdengiya dewletên navneteweyî nayê wê wateyê ku van kiryarên Tirkiyeyê, nabînin, berovajî vê yekê baş jî dibînin yek bi yek qeyd dikin da ku dema ji wan re lazim kir li dijî Tirkiyeyê bi kar tînin. Mixabin em êşan dibîn, em tehdeyê dibînin lê ew her tiştî ji bo berjewendiyê xwe dikin. Ji bo vê yekê jî hewce ye kurd yekitiya xwe bi awayekî lezgîn pêk bînin. Berovajî vê dê leystikên Tirkiyeyê li ser kurdan xilas nebin."



# 50 saziyên kurdistanî maseya krîzê ava kirin



Nûnerên saziyên kurdistanî li bajarê Kolnê yê Almanyayê bi boneya li dijî operasyona Tirkiyeyê li ser axa başûrê Kurdistanê , biryar dan ku bi hev re tev bigerin û maseyeke krîzê ava kirin. Ji her saziyekî nûner cihê xwe li ser maseyê girtin.

Bi navê 50 saziyan, Hevserokê KCDK-E'yê Yuksel Koç, Ronak Ahmet (KNK), Mimamed Haci Ahmet (Hizbî Sûî Kurdistan), Mahmût Davût (P.D.K.S.), Goran Babaaîl (Tevgera Goran), Dersim Alalî (PYD), Sabrî Eryîgît (PÎK), Nebez Abdullah (hunermend), Hafiz Tûrhali (CÎK), Çiya Mihemedî (Komala), Haci Çelîk (NAVYEK), Ferîdûn Knjrînî (rojnameger), Diyar Başû (KCDK-E Başûr), Îbrahîm Vesta Hasan (Pêşmergeyê Derîn), Yildiz Fîlmcî (KON-MED), Ahmad Hbash (Dîwana KCDK-E), K. Îmad (Herwesî), Bedran Mosa (PDKS), Mohammad Daoûnd (PDKS) û Engîn Sever (FED.MED) tev li civînê bûn.

**Banga berpirsyariyê**

Hevserokê KCDK-E'yê Yuksel Koç li civînê axivî û anî ziman ku Tirkiye ne tenê li dijî PKK'ê ye, dijî tevahiya kurdan û Kurdistanê ye û dest nîşan kir ku gelê kurd bi hevûdu re tev bigere dê bikaribe pêşî li van êrîşên bigire.

Koç anî ziman ku li her cihên kurd lê hene wezîfeyên mezin dikevin ser milên rewşenbîr, nivîskar, sazî, hunermend, siyasetmedaran û destnîşan kir ku ew bang li her kesî dikin ji bo rawestandina êrîşên Tirkiyeyê bi berpirsyarî tev bigerin.

Di civînê de biryar hate dayîn ku li gelek welatên Ewropayê û li Tirkiyeyê li dijî operasyonên dagirkeriyê çalakî bên lidarxistin.



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Divê kurd xwedî li hebûna xwe derkevin

Di van çend salên dawî de dewleta tirk ji bo di şerê li dijî kurdan de encam bigire û polîtîkaya xwe ya dagirkeriyê li herêmê bi cih bîne, di nav êrîşeke berfireh de ye.

Ev êrîşên piralî bi qada leşkerî tenê ve ne sînordar in. Di qada siyasî, çandî û civakî de jî ji bo îradeya kurdan neyê temsîlkirin çi ji dest tê dike. Di bin navê cuda de li ser kurdan êrîşên qirkirinê tên meşandin. Li dijî van êrîşan heya niha asta berxwedana ku derketiye holê jî sînordar e.

Ji bo vê berxwedanê bişkîne û di siyaseta xwe ya qirkirinê de bi ser bikeve gelek sûcên mezin tê kirin. Jê cuda, li hemberî van heya niha ji derveyî raya giştî ya kurd û Çapemeniya Azad tu kesî dengê xwe nekir. Lewre ev siyaseta qirêj a li ser civaka kurd tê ferzkirin jî ji nedîtinê ve hatin. Tevî li herêmê sûcên di qada navnetewî de wekî sûcên mirovahiyê tên pênasekirin û jiyîn jî bêdengiyeke mezin heye. Bê guman ev bêdengî tê wateya erêkirina êrîşan.

Li bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê dewleta tirk ji bo di vê polîtîkaya xwe ya anti-kurd de bi ser bikeve li gel hêza NATO û piştgiriya qada navneteweyî, ji pêkhatiyên herêmê jî alîkariyê digire. Di vê pêvajoyê de hevkariya hêzên herêmî ya bi dewleta tirk re ji her alî ve dijî hebûna gelê kurd e. Ev kesên ku berjewendiyên xwe yên şexsî ango malbatî li ser yên neteweyî dibînin dibin amûrê destê neyaran. Mixabin di nav civaka kurd de jî li dijî van kesan ango li dijî van pêkhateyan bêdengiyek heye. Ew jî ji vê bêdengiyê hêz digirin û di êrişên xwe de hîn çavsortir dibin.

Bi vê hevkariyê Tirkiye li nav sînorê başûr li dijî kurdan êrîşan pêk tîne. Tevî ku hemû kurd dizanin ev êrîş li dijî tevahiya kurdan e û bi van êrîşan dixwazin destkeftiyên kurdan ji holê rakin jî bêdengiya heyî têkoşîna li dijî van êrîşan lawaz dike.

Îro li dijî van êrîşan hêzek tenê disekine û ev hêz ji xweparastinê zêdetir ji bo hebûna kurdan ji holê neyê rakirin, îradeya wan neyê tunekirin û destkeftiyên wan yên li çar parçeyê Kurdistanê neyê talankirin têdikoşe. Ji ber vê yekê têkoşîna li dijî hewldanên dagirkeriyê tê meşandin divê bi tevlîbûna hemû kurdan, di asta herî bilind de bê meşandin.

Bi van êrîşan ve girêdayî hin deverên Kurdistanê di pêşengiya hêzên navneteweyî de mijûlkirin ango xapandina kurdan heye. Di rastiyê de têkiliyên heyî hemû têkiliyên berjewendiyê ne. Divê van nêzîkatiyên ku di qada siyasî ya navneteweyî de tu giraniya xwe nîne ji bo kurdan nebin mijara bazarê. Divê neyê ji bîrkirin ku heya kurd nebin hêz û xwedî li hebûna xwe dernekevin ne gengaz e ku ji aliyê hêzên navneteweyî ve cidî bên girtin. Lewma beriya her tiştî divê kurd ji bo hebûna xwe şer bikin û têbikoşin. Ev şerê azadiyê niha li ser milê PKK'ê tenê maye. Ev jî berfirehkirina eniya têkoşîna Azadiya Kurdistanê teng dike. Lewra divê li her çar parçeyê Kurdistanê û deverê gelê kurd bi sazî û rêxistin rabin.

Ger li dijî hewildanên dagirkeriyê helwestekî yekgirtî û xurt ji aliyê kurdan pêş bikeve wê hemû plan û polîtîkayên îmhakirina kurdan dikin hedef jî vala bên derxistin. Lewma, divê hemû kurd baş bizanibin ku ev êrîş ne êrîşên ji rêzê ne û bi van êrîşan tenê beşeke kurdan nakin hedef. Niha roj ew roj e û divê her kurd xwedî li hebûna xwe derkeve. Naxwe wê pir dereng be.

rupel 7++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:39 Page 1



# Rewşa aboriya Rêveberiya Xweser

Navenda Nûçeyan

## Aborînas Elaadîn Ferhan têkildarî rewşa aboriya Rêveberiya Xweser axivî û da zanîn ku herêm di nav şer de ye û rastî êrîşan tên ev yek jî aloziya aboriyê mezintir dike

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di encama şerê 10 salan de di biyavên berxwedanê de li tevahiya cîhanê bû mînakek. Li gel vê yekê rastiyeke herêmê heye ku ew jî bi polîtîkayên hêzên navneteweyî û yên Tirkiyeyê, herêm bi krîza aborî, zirarên mezin gihandiye beşên çandinî, endustrî û bazirganiyê.

Herêm hem ji derve ve hem jî ji hundir ve di nava dorpêçekê de ye. Ji bo ku krîzê kûrtir bikin deriyên bazirganiyê jî li ser herêmê hatine girtin. Ev yek hem ji aliyê dewleta tirk hem jî ji aliye hikûmeta Şamê ve tên kirin. Mirov dikare bibêje herêm ji aliyê aborî, siyasî hem jî ji aliyê leşkerî ve bi giştî di bin dorpêçeke berfireh de ye.

**Piştî vetoya Rûsyayê derî hat girtin**

Piştî ku Rûsya di Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî de veto bi kar anî, deriye Til Koçer/Yerûbiyê di sala 2020'î de ji bo derbasbûna alîkariyên navneteweyî ve hat girtin. Vê jî bandoreke mezin li ser rewşê kir ku zêdetirî 5 milyon şêniyên herêmê û koçberên ji tevahiya herêmên Sûriyeyê berê xwe daye herêmê.

**Aloziya aborî ya li herêmê**

Têkildarî mijarê aborînas Elaadîn Ferhan axivî û da zanîn ku aloziya aborî ya li herêmên Rêveberiya Xweser ji ber gelek sedeman e û wiha got: "Sedema yekemîn ew e ku herêm di nav şer de ye û tim rastî êrîşên Tirkiyeyê tê. Hemû hêzên rêveberiyê hewl didin destkeftiyên Rêveberiya Xweser ji hemû aliyan ve têk bibe. Ya duyemin, newekheviya di navbera mûçe û lêçûnan de ye. Ji ber lîreya Sûriyeyê li hember dolar pir ket û kelûpelên heyî bi dolar tên kirîn û firotin tevahî şêniyan zirar dît."



**Zextên derve**


Aborînas Ferhan diyar kir ku krîza aboriyê ya li herêmê ne di encama çewtiyên Rêveberiya Xweser de ye û wiha pê de çû: "Ew ne çewtî ne, ji ber zextên derve hene û armancên wan binketina civaka demokrat e."

**Êrîşên li dijî herêmê**

Ferhan hişyarî li ser fişarên derve û êrîşên li dijî herêmê da ku armanca wan têkbirina projeya Rêveberiya Xweser e û bal kişand ser hin kesên ku li herêmê xwedî armancên xerab in û dixwazin ewlehî û aramiya herêmê têk bibin. Ferhan destnîşan kir ku dê aloziya aboriyê ya li herêmê rê li pêş kesên ku armancên wan xerab in veke ku hestên nîjadperestî û mezhebîtî provake bike û wiha axivî: "Dê ew yek rê li pêş bertîlan (rişwet) veke ku tunebûna wê hiştiye Rêveberiya Xweser bi ser keve."

**Hejmara karmendan**

Aborînas Elaadîn Ferhan axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Rêveberiya Xweser xeteriya aloziya aborî baş dizane, ji lew re gelek caran mûçeyên karmendên xwe bilind kirin û derfetên kar ên li herêmê dabîn kirin. Her wiha li gorî aliyên berpirsê hejmara karmendan zêdetirî 126 hezar e. Rêveberiya Xweser komeleyên mezexêran ji bo piştevaniya hin madeyên xwarinê yên sereke vekirin û piştgiriya madeyên stratejîk mîna nan û sotemenî bi rêya saziyên xwe kir."



# Agirbesta di navbera Filistîn û Israîlê de

Navenda Nûçeyan

Şerê di navbera Israîl û Filistînê de ji 10'ê gulanê heta 21'ê gulanê berdewam kir. Şerê ku li gor berjewendiyên hêzên navneteweyî berdewam kir û bi biryara heman hêzan jî hat bidawîkirin.

Di nava 11 rojan de herî kêm 250 kesî jiyana xwe ji dest dan. Misirê di navbera şerê Israîl û Filistînê de navbeynkarî kir. Gelek hewldanên qayîlkirina aliyên şer hebûn lê hewldana herî berbiçav a Misirê bû. Piştî ku li Xezayê agirbest pêk hat, Qahîreyê 2 şandeyên ewlekariyê şandin Til Avîvê da ku çavdêriya agirbestê bike.

Serokê Amerîkayê Joe Biden jî der barê agirbestê de da zanîn ku Misir û hin welatên din ên ku ji bo agirbestê kedeke mezin dane û ev tiştê anî ziman: "Ez spasiyên xwe pêşkêş dikim ji bo serokê Misirê Abdulfetah El Sîsî û rayedarên Misrê yên ku roleke girîng di vê agirbestê de lîstin. Em kêfxweş in ew şerê dijwar ku bû sedema kuştina gelek sivîlan, bi dawî dibe û ez sersaxiyê dixwazim ji hemû malbatên israîlî û filistînî yên ku di şer de jiyana xwe ji dest dan."

Her wiha Biden da zanîn ku wî di axaftina xwe ya bi Netanyahû re bi bîr xistiye ku mafê wan ê xweparastina li hember êrîşên Hamas û komên terorîstan heye.

Wezîrê Parastina Israîlê Benny Gantz jî di Twitterê de got ku ev ji bo wan serkeftina leşkeriya bêhempa ye.

Piştî agîrbestê her du aliyan jî serkeftina xwe ragihandin. Alî Barakeh ê peywirê Hamasê diyar kir ku ev agirbest têkçûna Netenyahû ye.

# Banga ji bo boykotkirina hilbijartinê

Di 26'ê hezîranê de dê li Sûriyeyê hilbijartinên serokatiyê dest pê bike. Ji niha ve ji aliyê hin sazî û partiyên siyasî ve bertekên ku dê tev li hilbijartinan nebin derketin holê. Yek ji van partiyan jî ya bi navê Partiya Yekitiya Suryana ye.

Partiya Yekitiya Suryan daxuyaniyek li ser malpera xwe ya fermî û malperên tevna civakî belav kir û dest nîşan kir ku dê tev li hilbijartinên seroktiyê yên Sûriyeyê nebin û red bikin. Her wiha bang li gelê suryan û asûr kir ku hilbijartinan boykot bikin.

Partiyê di daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku armanca lidarxistina hilbijartinên bi vî rengî ew e ku hikûmeta Şamê hegemonyaya xwe ya li ser li herêmên ku kontrol dike, zêde bike û wiha got: "Her wiha hewl dide rewabûnê bi dest bixe da ku xwe ji aloziya siyasî û aborî xilas bike. Ev yek jî dide diyarkirin ku ew tenê çareseriyên leşkerî û ewlehî esas digire û çareseriyên siyasî yên li gorî biryara 2254`an a NY'yê red dike."

Partiyê teqez kir ku ew bi çareseriya siyasî û pêkanîna demokrasiyê ya ber bi Sûriyeyeke azad, demokratîk, pirreng û nenavendî re ne û bang li hemû suryanan kir ku li hemberî rejîma zordest bisekinin. Partiyê got ku ew lidarxistina hilbijartinan red dikin û bang li gelê suryan, asûr û hemû gelê Sûriyeyê dikin ku hilbijartinan boykot bikin, ji ber ku beşdarbûn tê wateya berdewamkirina kuştin, koçberkirin û girtinê.

Her wiha partiyê bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku biryarên xwe çalak bike û berjewendiyên gelê Sûriyeyê wekî armanceke ku divê pêk were, nîşan bide da ku bigihêjin çareseriyeke siyasî ya li gorî hemû aliyên Sûriyeyê û şer û destwerdanên derve yên Sûriyeyê rawestîne. ***ŞAM***



Destar

Ehmed Pelda

# Êşên derûnî û pêwistiya nêzîkdayîna feylesofî

Gava ku em danişin û bi rêyeke rast li ser halê xwe piponijin, divê em an hişê xwe bixwin an jî xwe bikujin. Lê nabe, me nekiriye û em nakin. Em newêrin hevrûyî xwe bibin û lewma jî ji xwe direvin. Dewsa bixwazin hevrûyî kela dilê xwe bibin, an jî eş û kulên xwe bibînin, em berê xwe didin derveyî xwe. Lê digerin ku hinekan bibînin û bikin ber sûcên kula dilê xwe. Ji ber ku heyanî em bi awayekî bi êşa dilê xwe re çareyekî nebînin, nikarin jiyana xwe ya rojane bi asayî bimeşînin, an jî ne pêkan e ku wek her gav kar û barên xwe bikin.

Li gorî çanda gel û civatan her kes bi terzekî ji xwe re çareyan dibîne û pirsgirekên takekesî an çareser dike, an piştguh dike an jî taloq dike. Lê tu carî nikarin ji holê rakin. Belkî jî ne pêkan e. Lê ya pêwîst bi hişyarî û bi haydarî binasin û bikaribin pê re bijîn.

Mesela di nava civata me de têgîn û aktorên wek nivîşt, şêx, mele, rûspî, dayik, heval, falbêj, derûnnas û hwd xwedî roleke girîng in. Bi diayan, şîretan, falan, nivîştan baweriya xwe tînin, tînîn ku hew zanin bi saya wan em xurt dibin û li hember pirsgirekên rih û canê me kul dikin re dicengin, diçewilin. Her çiqasî veguherîna ber bi modernîzmê ve derûnnas, mamoste, rêber hebin jî hê di nava civata me de negîhiştine asteke payebilind.

Halbûkî jîyana modern, bajarî, ku têkiliyên mîrovan bi nas û nenasan re gelekî zêde ye û tevlihev e; bi serê xwe li ser piya mayîn ne hesan e. Divê hin xwepêgirtinên takekesî hebin ku bikaribe xwe pê ragire.

Wekî pîşe û hunerek hebe, peydakirina kar û xebatê û bi sayê wê jî debara jîyanê hêsan e. Rol û statu, li gor vê jî têkilî û rengê danûstendinê bi civakê re eşkere dibe. Lê ev tenê gavek e. Kesekî ku hemû pirsgirekên xwe yên aborî çareser kiribin jî xwedan derd û kul in. Bi saya serwet û saman û pereyan belkî jî hin êş û derdan re çareyek dibînin û kela dilê xwe ditemijînin. Lê ji binî ve çareserî ne hêsan e. Wekî tê zanîn li gor rewşa aborî, statu, rol û têkiliyên kesan jî nexweşiyên cuda yên derûnî peyda dibin. Gava yekî hejar ji belengaziya xwe dilzar e. Yekî zengîn jî ji ber bêgaviya bêalternatîfbûyîna kar û jîyana xwe tengezar e. Çawa hejar belengaziya xwe dike kul û derdên xwe û ji bo çareseriya vê êşê xwe diêşîne, zengîn jî ji bo guhertina hîm û stûnên pergala xwe diqilqile. Rikebariyê bi hevrikê xwe re dike. Heke bi rê û dirbên asayî li ser nekeve, dest diavêje dek û dolaban an jî zordariyê ku li hember hevtayê xwe ser bikeve. Yek jî nebe li ber xwe dikeve, nexweşiya hiş pê digire.

Di nava civatên pîşesaz ango modern de takekes hewceyî alîkariya profesyonel ango pisporane ye.

Êdî bêyî bijîşk parastina laş ne pêkan e. Jiyana bajarî bi serê xwe çavkaniya stres, şayiş û bandora wê ya ji bo nexweşiyên laşê mîrov in. Giraniya kar, xwarinên dermankirî, xewa kêm, êşên debarê, tengasiyên têkilîyên cîvakî û çandî bi hêsanî riya êşa derûnî û bedenî vedikin. Hin kes hene ku li hember tengasî û kêşeyan xemsar in. Lê hinek jî hene ku cançûyî û xemxur in. Kêliya tenê bi êşa dilê xwe re rûbirû bimînin şayişa wan zêde dibe. An hişê xwe dixwin an jî canê xwe. Lê şîretên rûspiyan, parvekirina derd û kulan bi hevalan re, diha û şîretên şêx û meleyan, gotinên falbazan an jî hevdîtin û analîzên derûnnasan dibin destekar ku kes bikare derûniya xwe baş bike.

Tê zanîn ku her diçe rola rûspî, şêx, mele û falbazan kêm dibe. Dewsa wê jî rawejkar/şêwirmend, hosta, mamosta, zanyar û derûnnas cih digirin.

Beramberî danûstendina van kesan jî tengasiyeke din heye ku tu carî teşe nagire. Belkî jî bingeha nexweşiyên jiyana modern e. Kes êş û derdên xwe bizanibe jî wê pê re çawa tekoşînê bike nayê zanîn. Gava kesek bibêje "ji bo siberoja xwe ez ê çibikim?" her tişt mişt dibe, bê liv û tevger dimîne. Hin ekolên derûnnasiyê dibêjin; "hevrûyî be, di bin zimanê te, hişê te de çi hebe vereşîne, derxîne bide pêş çavên xwe û pê re têbikoşe." Hin ekol jî berevajî vê dibêjin; "kêşeya xwe bin cilk bike, neyne hişê xwe, tu çiqasî zû ji bîr bikî tu yê ewqasî zûtir azad bibî. Lewma dewsa wê bi tiştekî cuda ve tije bike û serê meseleyê bigire û bipêçe."

Heke em biryar bidin û hevrû bin, lê em ê çawa bi kêşeyê re têbikoşin?

An jî heke em biryar bidin û veşêrin ku divê dewsa wê bi tiştekî din tije bikin, lê biçi? Çawa? Û çima?

Vêca di vê xalê de rola şêwirmendî/rawejkariyê girîng e. Mixabin di nava civata me de hejmar kêm e, ku yên heyî jî ne bes in, ne têrker in. Ji ber ku zanîna hin metodan/rêbazan yên pisporî têrê nakin. Divê feylesofîyek, dîtinek, îdeolojîyek, mentalîteyek hebe. Ev merc ji bo bijîşkanjî, ji bo derûnnas û şêwirmendên aborî, cîvakî, sîyasî jî pêwîst e. Ew pisporên ku li gor perwerdeya pergala heyî, tenê bi teknîkî nêzî merivan dibin û wan wek mişterî dibînin ku bi vî halî tu carî nikarin ji derdan re bibin derman.

Belê ji bo her kesî mamosta, hosta, rêber, rawejkar, derûnnas, bijîşk hwd êdî lazim in, neçar in, lê kêleka zanîna teknîkî hebûna feylesofî, nirxî, bawermendî, bîrdozî jî merc e.

rupel 8+++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:35 Page 1





# Ukrayna veguherî qada hovîtiyê



Kurdistan Lezgiyeva

Îro em encamên hilweşîna Sovyetê dibînin. 30 sal piştî hilweşînê pêvajoyên li welatên sînor ên li derdora Rûsyayê gihîştine dawiya xwe ya mantiqî, fîzîkî û dîrokî. Li her derê rewş cuda ye, lê li her derê neyînî ye. Bi berhevdana rewşa jeopolîtîk û civakî-aborî ya îroyîn a li welatên piştî-Sovyetê yên dorhêla Rûsyayê, îro û 30 sal berê, mirov dikare xirabiya wê ya cidî destnîşan bike. Bi rastî, her welatekî Sovyeta-berê xwe di dereceyên cur bi cur ên hilweşîna aborî û nakokiya kûr a îdeolojîk a navxweyî de dît.

Çavdêriyeke bihêz heye ku dibêje tiştên girîng li cîhanê bi rengekî berbiçav guherine. Di payîna pêşîn de, tenê Ukrayna heye. Heya 2018'an rayedarên Kîevê digotin ku ew ji ber gelek sedemên objektîf nikarin "peymanên Minsk"ê pêk bînin. Mînak prosedûra nirxandin û pejirandina qanûnên nû nahêlin ku guhertinên hewceyî makezagona Ukraynayê di nav dema ku ji hêla peymanê ve hatiye destnîşankirin de were kirin. Her çiqas di belgeyê de dîrok tune bûn û hin jî tune ne jî ji derve ve rastiyeke giranbiha ya burokratîk xuya dikir. Ji bo destpêkirina prosedûra venêrînê, divê partiyek an komeke parlamentoyê pêşnûmeqanûnekê amade bike. Lê peyman diyar nake ku divê kî be. Kesek ji hêzên ku li welêt hene bi dilxwazî qebûl nakin ku tiştekî wisa bikin biryar. Ji bo "dîtin, îqna kirin û lihevkirinê" dem hewce dike.

Verkhovna Rada qanûnek "Li ser taybetmendiyên dewletê siyaseta dabînkirina serweriya dewleta Ukraynayê li ser erdên bi demkî dagirkirî li herêmên Donetsk û Lugansk" eşkere Donbass wekî axeke dagirkirî nas kir. Bi qanûnî, vê helwestê peymanên Minskê bi tevahî bê hurmet kir. Ji ber ku ew rasterast statûya xakeke dagirkirî li başûrê rojhilatê welêt, bi tevahî li derveyî wateya danûstandinên bi rêveberiyên herêmî re bû xist nav rîskeke bêveger. Tevî wê jî rayedarên li Kîevê şandina şandeyên xwe ji bo civînên Koma Sêalî berdewam kir û heta pirsgirêkên heyî yên pêkanîna "mercên Minsk" ji bo Ukrayna gotûbêj kirin.

Û bi dû re, di nav salekê de, aliyê ukraynî di cih de ji bêdengiya sabotekirina prosedûra muzakereyê, bi riya nîşana rasterast ku "peymanên Minskê girîngiya xwe ji bo Ukraynayê winda kirine", ber bi redkirina siyasî û erdnigarî ya Minsk ve çû.

Çi qewimî?

Rojavayê di dawiya dawî de li Ukraynayê "her tiştên kêrhatî" xwar. Welat bi Yekîtiya Ewrûpayê re peymana komeleyê ya giran îmze kir, li hev kir ku pîşesaziya xwe tasfiye bike, her çiqas xwedî potansiyel bû jî. Ew bi serê xwe ketiye deynan, mezinahiya xwe ji 27,9 milyar dolarî gihandiye 51 milyar dolarî, ya ku 16 milyar dolarî wê digihîje 19 hezar û 500 milyar dolarî niha di destê fonên darayî yên navneteweyî yên taybet de ye. Bi fermî yên ne xwecîhî ango biyanî tenê jî sedî 9 deyn xwedî dikin. Ji sedî 36 ê din - li Bankeya Neteweyî ya Ukraynayê (2-3 wê ji IMF deyn kirî ye) û ji sedî 50 - li bankên taybetî yên Ukraynayê ne. Lê ew bi xwe piranî di destê biyaniyan de ne. Li gorî nexşeya dravdana fermî, di dema 2021'ê de welatî neçar in ku bi qasî 3 hezar û 900 milyar dolar dravdanên faîzê bidin deyndaran û ji 11 hezar û 700 milyar dolarî ya deynê sereke vegerînin.

Di destên wan de ew qas pere tune ye. Li gorî Wezareta Darayî, Ukraynayê di sala 2020'î de bi tevahî 17 milyar dolar daye deyndaran ku ji sedî 49,6 ji hemî dahatên dewletê yên welêt girtiye. Tê de firotina milkê dewletê bi tevahî 9 milyar dolar in. Ji çile ya 2021'ê vir ve, ji sedî 95 ji tevahî sermayeyên hemî pargîdaniyên xwedandewlet ên têne xebitandin ji hêla sed pargîdaniyan ve têne hesibandin, sermayeya tevahî ya ku ji 59 milyar dolar tê texmîn kirin, ku nîvê wan stratejîk in û taybetkirina wan bi qanûnî qedexe ye.

Serokê Ukraynayê Vladimir Zelenskî qanûneke bi sernavê "" Li ser guhertinên hin kiryarên zagonsaz ên Ukraynayê yên der barê şertên veguhestina erdê çandinî "de îmze kir. Li gorî wê, ji 1'ê tîrmeha 2021'ê, moratoryûma firotina erdê çandiniyê, ku ev 18 sal in li welêt di meriyetê de ye, tê rakirin.

Ev nîşaneyeke girîng e ji bo ku maliyeta milkê mayî ya paşîn tê çapkirin. Rûbera erdê çandiniyê li Ukraynayê digihîje 17 milyon hektaran, ku 10 hezar û 500 milyon ji wan di kirêya demdirêj de ye ji saziyên karsaziyê û dora 3 milyon jî malên kesane ne. Bi tevahî, ev erd ji hêla 7 milyon hemwelatiyan ve, yan jî ji sedî 16 nifûsê "tê xwedîkirin".

Naha bihayên axê li Ukraynayê di hektarekê de, di navbera 1,2 hezar dolar û 3 hezar dolar dertê holê. Bi navînî li welêt, ev nêzîkî 2 hezar dolaran dide. Li gorî pisporên Bankeya Cîhanî, di pêvajoya destpêkê de ya damezrandina bazara bazirganiya azad a ji bo erdê çandiniyê, bihayê navînî ya hektarekî dê kêm zêde bibe 3- 3.5 hezar dolar, û planên herî balkêş dê her yek bi hêsanî 6 hezar be.

Ev tenê di qonaxa destpêkê de ye, ji hingê ve tê çaverêkirin ku pargîdaniyên mezin ên çandinî yên navneteweyî derbasî welêt bibin, ku latifundistan hêvî dikin ku di dawiyê de sermayê bifiroşin. An ji bo kirêdariya demdirêj, an jî bi tenê bifiroşin. Li ser bingeha lêpirsînên nefermî, analîzkar digihîjin encamekê ku di dawiyê de dê ji sedî 40 erd were firotin û ji sedî 60 jî wê were kirêkirin. Bihayê bazarê pêkan e hektarek bigihîje 6 hezar dolarî.

Bi tevahî, derkete holê ku, bi biryara wî, Zelensky sermayeyeke ku nirxa wê bi tevahî 81 milyar dolar e, derxistiyê firotinê. Wekî din, dewlet dê jê tene ji sedî 30 bistîne, ji ber ku rahijmendiya axê dê bi "rêjeyên civakî yên kêm", bi sedî 70-80 nirxa bazara heyî, biçe. Yên mayî wê têxin berîka "xwediyên nû".

Îroniya tiştên ku diqewimin ev e ku di bêjeyan de hema hema hemî ukraynî, ji xeynî tenê ji sedî çend banker û brokkerên ku li bendê ne destên xwe baş li ser danûstandinên servîskirinê germ bikin. Çi dibe bila bibe, bi fermî li dijî destûra bazirganiya serbest li erdê çandiniyê ne. Mîna, milkê neteweyî û her tişt...

Wekî din, metirsiyeke cidî heye ku biyaniyên bêwijdan axa reş a berdar bikirin, wê qut bikin û bibin hin Îmaratên Ereb an Qatar. Lê di rastiyê de, ev her 7 milyon "kirêdarên demdirêj" ên niha xeyal dikin ku "ne biha" bin ku bibin xwedan da ku an bi firotina sermayê zû zû dewlemend bibin an jî veguherin niştecîhên dewlemend. Jixwe, rant 81 milyar dolar e!

Berê, dema ku çandinî ji sedî 6'ê, ji sedî 8'ê aboriya Ukraynayê dagir dikir, pêkhateya siyasî ya pirsgirêkê bê guman li ser aboriyê serwer bû. Mirov, nemaze yên "cidî", xwediyê çavkaniyên din, pir bi kêr xwediyê "destkeftiyan" bûn. Ji ber vê yekê mirov dikare xwe ragire ku moratoryûm bimîne. Lê niha dema birçîbûnê hatiye, dema prensîbên bilind tune bûye.

Û îroniyeke din, ew ne Poroshenko bû, ku bi tundî ji hemû aliyên siyasî ve hate rexnekirin û ji hêla populîstan ve, wekî "firoşkarekî nerm" ê bêşerm hat rexne kirin, lê Zelenski, ji hêla ûkrayniyan ve wekî "mirovê me, ji gel" hate hilbijartin.

Lê belê, ev êdî ne girîng e. Moor karê xwe kiriye, Moor dikare here - ev gotina navdar tenê bi qismî zîgzageke çaverêkirî di çarenûsê de nîşan dide.

Ukrayna çima metirsîdar nabe?

Ji ber ku olîgarkên xwedan hertiştî dev ji ukraynîbûnê berdane. Her çiqas bi fermî ew hîn jî wekî wan tên ferzkirin jî lê karsazî û sermayeyên wan bi piranî di qada aborî ya rojavayî de ne, ku niha ew bi rengekî hedef û ne-eşkere bi wan re tê kirin. Bi gelemperî, Ukrayna bi rastî dev ji dewletek navendî berda, veguherî ekraneke ku li pişt wê gelek kom û komên piçûk di rejîma "her mirov ji bo xwe" de şer dikin xuya dike. Îro welat li ber parçebûnê ye di heman demê de tu şansê wan tune ye ku aboriya xwe yek bi yek dirêj bikin an jî bibin yek.

Ger em qala pevçûna leşkerî ya rasterast di navbera Rûsya û Ukrayna de bikin, dê her du alî jî bi hemû hêza xwe hewl bidin ku ji senaryoyeke wisa dûr bisekinin. Ji bo her du aliyan jî encamên pir pêşbînîkirî hene. Ukrayna rûbirûbûna xwe tundtir bike û Rûsya dikare piştgiriya ji bo komaran zêde bike, lê pir nefermî - bêyî ku bibe yekser beşdarekî vekirî yê pevçûnê. Wek tê xuyakirin vê carê jî wê modelên rûbirûbûnê yên ku berê hatine xebitandin werin bikaranîn. Di salên 2014-2015'an de, hevsengiya hêzan cuda bû - li Ukraynayê hema hema artêşeke amadeyî şer tune bû, ji ber vê yekê li başûrê rojhilatê welêt zû têk çû. Niha rewş guheriye - artêşeke welêt heye û di heman demê de hevkariyeke wî heye digel gelek welatên rojavayî, ji Dewletên Yekbûyî ta Tirkiyeyê. Ji ber vê yekê, ne diyar e ku gelo piştgiriya Rûsyayê ya Donbassê dê karibe li hember zêdebûna hêza Ukraynayê bisekine.

Heger Ukrayna di NATO-yê de neyê qebûl kirin û maf neyê dayîn ku siyaseta hevbendiyê bi rê ve bibe, di mijara "rûbirûbûna Rûsyayê de", wê hingê Ukrayna wê razî be ku li dijî Rûsyayê tenê di formata paşvexistina êrişa Rûsyayê ya rasterast de şer bike. Heya Rûs tankên xwe li ser sînor nekişînin, şer dê tenê bi peyvan be.

rupel 9++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:25 Page 1



## Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

### Şewey Qralan

Hepisxaneyêk bifikirê, mîyanê koy de wo û îdareyê hepisxanî destê mehkûman de yo. Hepisxaneyo bi nameyê xo "La Maca" mîyanê welatî de bi name û veng o. Bi merdimê ke semedê dizdî, tiryak, xapênayîş û kiştişê merdiman hamiyî girewtişî hepisxane kerdo pirê. La taybetîyêk enî merdimanê hepisxanî esta ke goreê kulturê welatê xo hereket kenê, bawerî înan goreyê edetann înan zehf xurt a.

Edetêk aneyîn est o: Şewa ke "Aşmîya Bi Gunî" veciyo şahî yena viraştiş. A şewe pîlê hepisxanî zîyafet dano heme tenê hepisxane de yê û çînaw bîn zî joy weçînenê ke qey înan rê hîkayeyêk vajo. Caw zehf muhîm zî etîya yo. Teno ke hîkaye vajo, dima ke hikayeyê ci biqedîyo zey qurban qeybî a şewe yeno kiştiş.

Ma qalê fîlmê derhêner Philippe Lacote kenê. Fîlmê welatê Qeraxê Ajî fîlmêk fantastîk o. Heta peynî bê merdim aciz bibo merdim ro hîktayeyê fîlmî temaşe keno. Fîlm bi awayêk modern verê xo dano Hîkayeyanê 1001 Şewe.

A şewa ke "Aşmîya Bi Gunî" veciyawa de pîlê hepîsxanî gere joy weçîno ke qeybî înan hîkeye vajo. Tam a çaxî ciwanêk newe kuno hepis û ew qeybî a şewe neyo weçînayîş. Lajek bê ke bizano go çi bêro serê ci dest bi hîkayeya xo keno. Her ke ew hîkaye vano, mehkûmê bînê xo erzenê meydan û çiyo hîkaye de bi dans anê ziwan. Dans, vînayîş, hîkaye, meraqê hepisçîyan heme kunê têmîyan û hîkayeya ma raver şina. Û tenêkew her kerge serê milê ci de wa û her kes zey merdimê ke gêc hawnena ê ra, yeno verê hîkaye ci, bi dizî vano, "Ti hîkaye biqedênê go to bikişê. Hîkayeya xo derg bike, meqedêne heta serê sibayî."

Lajek qalê hîkayeya "Qralê Zama" keno û heta te ra yeno keno derg û keno derg… Hetê ke ro ew hîkayeyê xo keno derg ke ger beşko heta roj vejîyo vajo go merg ra bixelesîyo; heto bîn ro şerê îqtîdarî pey perdî de dewam keno, sûîkast ro henîyan virazêno.

Derhêner Philippe Lacote serê kevneşopîya groît a Rojavayê Afrîka de bi hîkayeyan fîlmê xo viraşto. Fîlm serê nameyê welatê Qeraxê Ajî de bî berendamê Oscarî, heta "lîsteya kilme" zî hame. Fîlm Festîvala Rotterdamî û Festîvala Toronto de xelate girewt. Reyna DYA de zî Xelata Rexnegirê Amerîka-Afrîka ay Fîlmê Serkewte girewt. Fîlmo ke Festîvala Fîlman a Venedîkî de zî hame bî mojnayîş, ene aşme Festîvala Fîlman a Stenbolî de zî vejîya vernî temaşekerdoxan. Eno fîlmo serkewte, fantastîk hetêk ro qalê hîkayî kerd, heto bîn ro feqîriya ê însanan, ê însanê ke weko bîn çareyke înan çinîyo, hîkayeya însananê ke dinyaya înan xerepîyaya mojneno ra. Hetêk ro zî şerê desthilatî yê mîyanê hepsî de ardê verê çimanê temaşevanan.

Çawey ke dinya de heme hepisxaneyan de rewşe baş nîya, Tirkîya de zî enka rewşa hepisxaneyan baş nîya û şar grev de yo; enî hepisxanî de zî rewşa merdimê ke hameyî girewtişî qet baş nîya. Pêşnîyarê ma ew o ke şima firsend vîna temaşe bikerê; şima go qe poşman nêbê.

KUNYE:


Derhêner: Philippe Lacote

Kaykerdoxî: Abdoul Karim Konatê, Bakary Konê, Denis Lavant, Isaka Sawadogo, Jean Cyrille Digbeu, Laetitia Ky, Macel Anzian, Rasmane Ouedraogo, Steve Tientcheu, Zunon François Lopez.

Ziwan: Fransizî, Dyula, Nouchi

Mawe: 90 deqe

# 'Sifte cenîyan bikişê'



Meral Ozel

Pêro dinya sero netew dewletî ser şarî de taybet ke şaro ke vera hukumdariya înan xoverdano, tekoşîne dano lej kenê. Hama lete na lej kî dizda yeno ramitene. Namê xo kî lejê taybet o.

Nê polîtîkayanan tewr zêde wazenê ke cenî û gencan teslîm bigêrî. Wazenê hîn bikerî, ne gencî ne zî cenî dûstê înan de, dûstê zilm û zorvajiyî de vengê xo berz mekerî.

Hukumdarî qesê 'Sifte cenîyan bikişê' hîn tol nêvatî. Waxto ke cenî kerdî bêveng, cenî ke taqate ra dayî warî homete ke kenê binê tesîrê xo.

Her gucike dinya de cenî rastê zorvajiye yenê. Hama waxto ke jû cenî kewayirê kamayisê kurd bîye o waxt herîşî jêdena benê giran. Her hetî ra rastê herîşkarîya dewlete yenê. Eskera ya kî gurete polîtîkayê taybet ser cenîyan de yenê ramitene. Coka polîtîkayê lejê taybetî xorîyê. Cenî, domanî, xoza, zagon, pêro yenê hedef guretene.

Cenîyan ke bi tekoşîna serran xeylê rayî guretî û rêxistin bîyayena xo aver berdî, xeylê sazîyê cenîyan kî rakerdî. Coka bi raya qayûman sifte sazîyê cenîyan ameyî guretene. Dime ra kî cenîyê ke tekoşîne bi qerarîya danê ramitene ameyî pêgurêtene. Nîya armanca axme kerdena rêxistin bîyayena cenîyan de jû game ame estene.

Qirkerdena çand ra dima kî rayanê bînan ra na qirkerdene her waxt rojdem de pêcênî. Feqirîye ke letê polîtîkaya lejê taybetî ya. Vêşanîye û feqirîye ke tewr jêde cenîyan ser o tesîr kena. Êdî her çêber, her înson hedefê lejê taybet û psîkolojîkî de ro.

Dewleta Tirkîya bi raya perwerde, huner, aborî, îtîqat, çapemenîye nê lejê taybetî ca ana. Pêro nê rayan zerrê şarî de eve tersî axme kena, dime ra kî herîş kena. Qûwetê îqtîdarî, polîs û eskerî xo zerrê şarî de zorvajîya xo yê lejê taybetî giran kerd. Serranê peyênan de gorê nê polîtîkayan kurdan ser o qirkerdenêda pîle yena ramitene. Pêro nê rayan wazenê biresê armancanê xo.

Cenîyan ra pîya gencanê kurdan sero kî kayê qilerînî estê. Her gama xo de, kotî de nîyadanê rastê nê polîtîkayanê lejê taybetî yenê. Gencan oncenê zerrê tîryak, fuhiş, çik ke esto namê xiravîya wazenê mavenê gencanê kurdan de ca bibo. Wazenê gencê kurdan roz bi roz bixerepîyê. Xo înkar bikerî, bînê destê hukumdarîya înan de jê kole biciwîyê.

Tecawizê cenîyan, domanan, kistene ke her roz jêde bena. Pêro na qileriye bingê xo nê lejê taybetî ra cêna. Coka vera bîyayîsanê niyanên de bêveng vinitis nêbeno. Qûwetê dewlete her hetî ra herîş kenê. Coka namê xo lejo taybet o. Çitur to kisenê, çitur to raştîya xo ra durî kenê, ebe xo kî nêzanena. Hama lejo taybet nîya yeno ramitene. Mezgê însonan ra kay kenê. Çiyê rindî xiravin, çiyê xiravinî ke rind musnenê. Roz bi roz, serre bi serre kulturê şarî vurnenê. Anê merhele hênen kî edî bena mordemê bînê destê kolonyalîstan. Waxto ke jû kes ame xapînayene, dest keno dormê xo xapîneno.

Jû raya xelesîyayîşî esta. Nê polîtîkayanê dewlete ferq kerdene, dûstê na polîtîka de xoverdayene, tekoşîn dayena.

## Dêrsim de polîsan çeke dart sereyê cinîyêke



Dêrsim de polîsan gama ke kontrolê nasnameyî kerdêne çeke dart sereyê cinîyêke. Meydanê Palavara yê Dêrsimî de Dêrsim de polîsan gama ke kontrolê nasnameyî kerdêne çeke dart sereyê cinîyêke.

Polîsî cinîya ke nameyê ci nêame musayene sey şikdare hesibna û nasneyê ci kontrol kerd. Goreyê şahîdan polîsan cinîye eşte erd û çeke dart sereyê ci. Bado ke cinîye qîrayî şarî vera polîsan nêrazîbîyayîş mojna. Polîsan seba ke şar vila bo gazê îsato şuxulna û çeke eşt hewayî. Cinîye gerreyê polîsan kerd.

Goreyê eşkerayîya Walîtîya Dêrsimî di personelê înanê ke hêrişê cinîye kerd wezîfeyî ra ameyî dûrfînayene. ***DÊRSIM***

# Festîvala Kultur û Xoza ya Dêrsimî dest pêkena



Festîvala Kultur û Xoza ya Dêrsimî reya yewine serra 1999î de badê kampanyaya 'Tatîlê xo Dêrsim de vîyarne' ameye viraştene. Serra 2000î de reya yewine Festîvala Kultur û Xoza ya Dêrsimî bi hawayêko fermî ameye firazkerdene. No tarîx ra dima Festîvala Kultur û Xoza ya Dêrsimî sey kultur her serre ameye firazkerdene la serra 2020î de rîyê Korona ra ameye taloqkerdene.

Festîvale tewr peynî serra 2019î de ameybî viraştene. Goreyê qeraro ke meclîsê Şaredarîya Dêrsimî ra vejîya, Festîvala Kultur û Xoza ya Dêrsimî ke her serre yena kerdene do mabenê tarîxanê 29, 30, 31 Temmuze, 1ê Tebaxe de bêra viraştene. Wextoke şaredarî de qerar ame girewtene endamê meclîsî ê Partîya Kede vatî ke ganî festîvale pandemî vera nêra viraştele. La bi rayanê zêdeyan qerar dîya ke festîvale mabenê tarîxanê 29, 30, 31 Temmuze, 1ê Tebaxe de bêra viraştene. ***DÊRSIM***




## Nivişta mîzê

Şêxek hebû ku herêma wî Hezro, Licê û Pasûr bû. Bi destpêka biharê re şêx û mirîdê xwe diçin zozanan. Ji ber ku di vê demsalê de gundî jî hemî li zozanan e, bi hatina şêx re gundî çi pirsgirêkên wan hebûn dihatin ji şêx re digotin û şêx jî li gorî pirsgirêkan ji gundiyan re nivişt çê dikirin.

Gundî bi niviştên şêx xenî bibûn. Lê ya pîrê ne tê de. Li vî gundî pîrek bi navê Fatê hebû.

Pîra Fatê ji gundiyekî re dibêje: Kurê min ez çi ji te veşêrim, ji Xwedê nayê veşartin: Ez şevê deh caran dertêm derve. Û rûyê min jî nade ku ji şêx re bibêjim. Tu karî ji şêx re bibêjî bila ji min re jî niviştekê çêbike.

Zilam dibêje ser çavan pîra min a delal; û diçe ji şêx re dibêje: Şêxê min; pirsgirêkekî pîra Fatê bi vî awayî heye!

Tu karî jê re niviştekê çêkî, ku pirsgirêka wê jî çareser bibe?

Şêx: Belê ez ê çêkim. Lê ji pîra Fatê re bibêje, bila ji min re kîsek hirî bîne.

Zilam diçe ji pîra Fatê re dibêje: “Pîrê, Şêx dibêje bila ji min re kîsek hirî bîne.”

Pîrê: “Kurê min, tu jî dizanî ku hiriya min tune ye. Lê ez ê ji şêxê xwe re du kîs mûyên bizina reş bînim baş e?”

Pîra Fatê du kîs mû dibe û dide şêx. Nivişta xwe ji şêx digire û tê malê. Nivişta xwe dixe binê kofîya xwe û wê şevê têr avê vedixwe û radizê. Lê wê şevê ji şevên dinê bêhtir dertê derve.

Sibetirê diçe cem şêx û ji şêx re dibêje: “Şêxê min, tu û Xwedê dihebînî ev çi nivişt e te ji min re çêkiriye? Îşev hetanî sibehê min stêrk hejmartine.

Şêx: “Pîrê min ji te hirî xwest lê te ji min re çi anî?”

Pîrê: “Şêxê min welehî hiriya min tune bû loma min jî ji te re mû anî.”

Şêx: “De kanê mîz bi mû disekine? Xwedê jê razî.”

Pîrê: “Welehî tu rast dibêjî,mîz bi mû nasekine! Ne sûcê te ye.!”

***Riza Uyar***



## Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Bi hêvî me ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe re tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin. E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**1-** Tiştekî min heye
Qesra spî bê derî
De bêjin ew çi ye?


**2-** Tiştek min heye
Mamê mino:
Çû kunê ne mar e
Bi pûrt e ne kar e

**3-** Tiştek heye
Ez çûm ser latekî
Piyê min ket çalekî

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
**1-** Hêk **2-** Kîvroşk **3-** Pêlav, sol

# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Navçeyeke Amedê 5. Xwedayekî mîtolojî yê Misira kevin 7. Koma pez 8. Qertafa dema bê 9. Qayde, fesal 13. Navdarekî kurd Ehmedê ….. 14. Dînî, ayînî 16. Kesên ku nikarin biaxivin 19. Herêmeke bakurê Kurdistanê 20. Yan, wekî din 21. Bi dimilkî jê re dibêjin (zerre) 22. alaveke şer ya kevnar 25. Daçekek 26. Resmî, zagonî 28. Balindeyeke ku bi refan tê xwedîkirin

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Bajarekî bakurê Kurdistanê
2. Zarok
3. Reşaya mirov ya ku li ber ronahî û tavê çêdibe
4. Koma balindeyan
6. Kevin
10. Alava ku pê devê hesp, qantir, ker û hwd.. tê girtin
11. Geliyekî bakurê Kurdistanê ku di sala 1930’î de komkujiyek mezin lê pêk hatibû
12. Bêquloç 15. Bawerî
17. Gêrik 18. Qiralk, balindeyeke reş
20. Mirovê pêşî ku ji alî Xwedê ve hatiye afirandin
23. Roj, tav
24. Rengek
27. Rojeke hefteyê

Bersiva hefteya borî



rupel 11++.qxp_Layout 1 21.05.2021 18:23 Page 1



# Westworld: Nûcîhanên Kolonyalîzmê

Navenda Nûçeyan

Jean Baudrîllard ê teorîsyenê hizra sîmulasyonê dema behsa heqîqet, rastî û modelên rastiya nû dike hem behsa endîşeyekê dike hem jî li derdora sînorên cîhan(bînî-y)eke nû diçe û tê. Di serdema me de êdî rastî wekî tiştekî ye: Tiştekî meriv winda dike, mîna kite goreya we ya winda, an jî mîna mifteha mala we ku carina mirov dibêje qey cinan ew biriye.

Rastî ji bo mirovan mîna pêdiviyekê ye, lê wateya vê pêdivîbûyînê di hemû serdemên mirovahiyê de guherî ye. Wisa dixuyê ku dê tim di nav guherîn û veguherînê de be. Lêgerîna mirovan a rastî û heta heqîqetê, wan ber bi sibehekê ve dibe. Lê di sibehê de êdî rastiyek bi xwe tune ye, gelek rastî û modelên rastiyê hene. Modelên rastiyê jî bi xwe re hesta cîhanafrîneriyê derdixe holê. Ji bo her rastiyekê cîhanek!

**Bibîrxistina Rojavayê Hov**

Westworld rêzefîlmeke honaka zanistî û dîstopîk a platforma HBO'yê ya Amerîkayê ye. Afrînerên wê Jonathan Nolan û Lîsa Joy xwe dispêrin pêşnûmeya Michael Crîchton a ku bi heman navî di sala 1973'an de nivîsîbû. Westworld li ser wê mîta amerîkayî ya ku ji bo ax û warê gelên çermsor afirandibû hatiye ristin.

Ew fîlmên kowboyan, ên meşhûr: "Kowboy, fotêr, hesp, şalên delingfireh, ew galûkên bi peniya gîzmeyên wan ve û ew demançeyên demançeyên Revolver ên li ber teşkên wan, li ser kembera navtengê wan; bi navê dîtir 'demançeyên jinişkêve', ve... Aha ev hemû xwedêgiravî amaje bi vî warî; warê jiyana hov dikin. Amerîkiyên ku xwe ji ser mêtingehan mezin dikirin ji vî warî re digotin: Wild West, ango Rojavayê Hov.

**Mêtingeh tiştek in**

Sînorên vê herêmê ji Çemê Mîsîsîpiyê dest pê dikir, yanî ew axa ku li aliyê rojava yê çem diket, hemû wekî Rojavayê Hov hatibû destnîşankirin. Rojavayekî (Ewropayê) Amerîka afirand û Amerîkayê jî li ser vê mîta rojavayîbûnê ji xwe re rojavayekî din afirand. Ev yek wekî mîtekê derkete holê û ji gelek berhemên edebî û sînematografîk re bû çavkanî. Rojava tenê ji bo yên rojhilat wekî warê şaristaniyê, warê pêşketinê dihat dîtin. Vê yekê rê li ber oryantalîzmê jî vekir. Lê ji bo Rojava (bi giştî mebest jê Ewropa ye) ne tenê rojhilat di heman demê de hemû hêl paşketî bûn û diviya hemû hêlên cîhanî bihatana şaristanîkirin. Ev ewropanavendî bû. Ji bo Ewropayê rojavayê wê jî (Amerîka) wekî parzemîneke paşdemayî, hov, nemedenî dihat qebûlkirin. Eynî mîna vê yekê; Rojavayê ku Amerîkayê ji bo xwe afirandibû jî Rojavayekî paşdemayî, hov û beyar bû. Amerîka li ser bingeha "medenîkirinê" nêzî rojavayê xwe dibû. Jixwe hemû dagirker li ser vê bingehê nêzîkatiyekê bi devera tê mêtingehkirin re datînin. Lewma mêtingeh ji



bo yên mêtinkar tim mîna "tişteyekê" ne.

**Rojavayê Hov ê nû**

Lê belê dema mirov di çarçoveya Westworldê de li vê babetê dinihêre ev yek heta radeyekê hem hatiye berovajîkirin hem jî tiştebûna (objebûn) wê hatiye dupatkirin. Lewra li Westworldê êdî teknolojiyeke pir serkeftî heye; cîhaneke teknolojîk, parkeke robotîk a şahiyê, hişê çêkirî yê pirpêşketî... Ev berovajîkirina Rojavayê Hov e. Yanî rojavayek heye lê rojaveyekî teknolojîk e. Lê herçî dupatkirina tiştebûna Rojava ye, ew jî dîsa di peywenda mêtingehkirinê de derdikeve holê. Parka Westworldê, an jî Cîhana Rojava dîsa ji teref mirovan (temsîliyeta Amerîkaya nû ye) û şirketan (temsîliyeta kapîtalîzma li lûtkeyê ye) ve tê dagirkirin. Ev senaryoyeke futurîst a siberojê ye û mirov dikare wê yekê di konteksta kolonyalîzma nû de jî binirxîne. Êdî şûna dewletan şirketên navneteweyî, an jî yên serneteweyî diçin deverekê dagir dikin û wê derê ji bo xwe dikin koloniyeke bikêrhatî. Jixwe me di demên nêz de dît ku êdî şûna dewletan şirket bi karê kişfkirina fezayê radibin.

**Mirovên maqûl, robotên maqûl**

Pergala dagirkeriyê ya ku bi me nas e çi ye? Bi qasî ku me tecrûbe kiriye û li rûpelên dîrokê hatiye nivîsandin, dagirkerî ew tişt e ku: "Dewletek, hêzek ji bo berjewendiyên xwe diçe dest datîne ser war û jîwara miletekî din, hêz û dewleteke din û hemû çavkaniyên wê yên madî û manewî ji bo xwe bi kar tîne." Çavkaniyên madî ji bo aboriya xwe xurt bike û zexm bihêle bi kar tîne. Her wiha çavkaniyên manewî jî dagir dike da ku dagirkerî temendirêj bibe. Ziman, çand, dîn, pêwendiyên mirovan tên dagirkirin da ku hêzên dagirker ji bo xwe mirovine maqûl biafirîne. Mirovên maqûl di siberojê de dibine robotê maqûl!

**Westworld û kolonyalîzma şahiyê**

Lê li Westworldê dagirkerî li ser têgeha "şahî-kêf-xweşî"yê pêş ketiye. Jixwe Westworld wekî Parka Şahiyê jî hatiye derbirrîn. Mirov ji bo çend xulekan xwe bextewar hîs bikin, ji bo daxwaz û arezûyên xwe pêk bînin û ji bo nemiriyê hîs bikin tên Westworldê. Ev yek hem lêgerîna mirovahiyê ya şaristanbûyînê (ji Gilgamêş dest pê dike) ye hem jî ***kolonyolîzma şahiyê*** ye.

Westworld parkek e, tê de robotên gelek pêşketî hene. Tu ferqa van robotan ji mirovan tune ye. Hinek şirket û xwediyên wan ên pêxemberane, ji bo mirovên ku negihîştine serdema Wild Westê (dawiya sedsala 19'an û destpêka 20'î) di siberojeke nêz de, ev park ava kirine. Ew mirovên ku negihîştine wê serdemê, bi xêra vê parkê diçin di nav wê cîhanê û wê jiyanê dijîn, dema xwe derbas dikin, daxwazên û pêdiviyên xwe pêk tînin. Helbet ji bo vê yekê jî divê pereyê we hebe. Di eslê xwe de Westworld jixwe ji bo hin dewlemend ji wê cîhana Rojavaya Hov têr bibin, hin pêdiviyên xwe dabîn bikin û arezûyên xwe pêk bînin hatiye avakirin. Ev yek jî bi xêra robotên androîd ên parkê çêdibe. Em ê di nivîsên bê de hewl bidin vê yekê û hin xalên din yên wekî; Disneyland, lêgerîna heqîqet û nemiriyê, şoreşa hewce hwd. nirxandinên xwe kûrttir bikin. Lê belê dibe ku civa hin kesan (li xwendin û temaşekirina) mijarên wiha neyê û meraqa wan jî li ser rêzefîlm û nivîsên wiha tune be.

# Erebê Şemo: Dahênerê romana kurdî

Ugur Dursun Adsiz

Îro salvegera 43'yan ya wefata nivîskarê romana ewil ya kurdî Erebê Şemo ye. Erebê Şemo ji malbateke şêxên êzîdiyan bû. Şemo di 23'ê çiriya pêşîn a 1897'an de li gundê Susuzê li navçeya Qersê, ku di wê heyamê de, di bin desthilatiya Rûsyayê de bû, hatiye dinyayê. Berî 43 salan, di roja 21'ê gulana 1978'an de, Erebê Şemo koça dawî kir. NivîskarTêmûrê Xelîl ji bo Erebê Şemo di nivîseke xwe de wisa dibêje: "Erebê Şemo bi salan di hepsên Sîbîriyayê de maye, xwe bi xwe ra çîrokên kurdî gotine ku zimanê dayika xwe ji bîr neke. Erebê Şemo û V.Î.Lênîn hev dîtibûn û li ser rewşa kurda bi hev ra peyivîbûn. Elfabaya kurdî-latînî ya pêşin Erebê Şemo û Îsahak Morogûlovê (Asûrî) di sala 1928'an de amade kirine. Wana sala 1929'an bi wê elfabayê pirtûka kurdî ya bi latînî ya pêşin li cihanê çap kirin bi sernavê "Xo-Xo Hînbûna Xwendina Nivîsara Kurmancî".

**Elfabeya Îsahak Morgûlov**

Sala 1927'an hikûmeta Ermenistanê (Komîsaryata ronkaye û perwerdê) ji bo hazirkirna elfebayê kurdî ya nû qirar qebûl kir. Elfabeya nû gotî li ser tîpên latînî bihata demezirandin. Bi biryara hikûmeta Sovyeta berê û Ermenistanê Erebê Şemo û Îsahak Marogûlov dest bi amadekirina elfabeya kurdî ya bi tîpên latînî kirin û di sala 1928'an de karê xwe bi dawî anîn. Pirtûka "Xo-Xo Hînbûna Xwendina Nivîsara Kurmancî" bi wê elfabeyê hat çap kirin. Ji sala 1930'î, ji 1ê nîsanê jî bi wê alfabeyê rojnameya Riya Teze dest bi weşana xwe kir. Erebê Şemo her wiha yek ji damezrînerên rojnameya Riya Teze bû.

**Çend Berhemên Erebê Şemo**

Şivanê Kurmanca, romana Kurdî ya ewil e. Romana Kurdî bi vê berhemê dest pê kiriye. Şivanê Kurmanca, di sala 1931'ê de ji aliyê Erebê Şemo ve bi Rûsî tê nivîsandin û heman salê tê weşandin. Ev berhem bi navê rûsî ***Kurdiskî Pastûx*** (Şivanê Kurd) li Lenîngradê, ji aliyê Weşanên Moloday Grandya ve tê çap kirin. Pirtûk 64 rûpel in. Di sala 1935'an de Erebê Şemo vê pirtûkê ji nû ve û bi kurdî dinivîse. Pirtûk di heman salê de li Yêrêvanê, ji aliyê weşanxaneya hikûmetê ve bi tîpên kirîlî tê weşandin. Roman ji 155 rûpelan pêk tê. Şivanê Kurmanca em di karin bibêjin wek serpêhatiya Erebê Şemo ye. Ew pirtûk rêyek nû vedike ji bona edebiyata kurdî.

Jiyana Bextewar, romana Erebê Şemo ya duyemîn e. Di sala 1959'an de hatiye weşandin. Şemo, di romanê de bi hûrgilî çanda kurdên Kafkasyayê nîşan dide. Di romanê de gelek erf û edet, şîn, şayî bi hûrgilî hatine nivîsandin.

Dimdim, romana Erebê Şemo ya sêyemîn e. Di sala 1969'an de hatiye weşandin. Di romanê de Şemo, bi temamî ji vegotina binezm dest bernedaye. Wî, di rûpelên romanê de cî daye gelek helbest û stranên der barê mijarê de. Bi vî awayî wî him berdewamiya vegotinê pêk aniye him jî xwendevan ji tama vegotina binezm haydar kiriye. Balkêş e ku di vê romanê de Erebê Şemo gelek kilam û helbest jî bi kar aniye.

Hopo, romana wî ya dawî ye. Di sala 1969'an de hatiye weşandin. Şemo, di romana Hopo de cî daye gelek adetên kurdan. Xwestiye ku jiyana wan a civakî bide nas kirin. Wî di vê romanê de jiyana civakî bi kitekit girtiye dest. Ji rabûn û rûniştinê bigire heta şîn û şahiyan qala her tiştî kiriye.

**Jiyana Erêbê Şemo**


Erebê Şemo di biçûkatiya xwe de, di dibistanê rûsan de wek xedeme dixebite. Li wê dibistanê bi alîkariya mamosteya dibistanê hînî nivisandine dibe. Mamosteya dibistane dibîne ku Şemo gelek jêhatî ye, wî digirê dibistanê û ew dibe xwendewanê dibistanê.

Erebê Şemo jiyanek çetin derbas dike û gelek caran li malên dewlemendên rûsan, ermenan û gelên din dixebite û mecbûr dimîne zimanê wana hîn bibe. Gora Eskerê Boyîk, Erebê Şemo bi 8 zimanan gelek baş dizanibû; kurdî, rûsî, ermenîkî, tirkî, yewnanî, azerîkî, almanî û gurcîkî.

Leşkerên rûs dema gundên kurdan digerin rastî Erebê Şemo tên û dibinîn ku Erebê Şemo kurdî, tirkî, rûsî û ermenîkî baş dizane, wî wek werger digirin arteşa rûsan. Wê demê kesên wisa pir kêm bûn. Erebê Şemo ji sala 1914'an heya 1916'an di arteşa rûsan de xebata wergêriyê di navbera rûs û gelên din de dike.

Piştî xebata artêşê ew diçe navçeya Sariqamişê û wê derê di çêkirina riya hesinî de du salan dixebite. Di nava xebatkaran de rastî gelek hevrêyên bolşevîkan tê û fikrên bolşevîkan di dile wî de rêyeke nû vedike û ew beşdarî karên wan yen siyasî û rêxistinî dibe.

Erebê Şemo di nava partiyê de gelek çalak dixebite û car caran di şeran de bîrîndar jî dibe. Wek mînak li derdorê Stavropolê ligel Gvardiya Sor beşdarî şerê bajariyê dibe. Du caran birîndar dikeve. Di sala 1918'an de li navçeya Dîgorê di nav kurdên êzidî de ji bo bolşevîkan xebatan dike. Di heman salê de dibe endamê Partiya Komînist a Rûsyayê. Ew çend salan li Bakû, Moskova û Tiblîsê ji bo komînîstan berxwe dide.



**Sirgûniya Erebê Şemo**

Dr. Eskerê Boyîk di pirtûka xwe ya bi navê "Çend dîdem ji edebiyeta kurdên Ermenistanê" de behsa sirgûnkirina Erebê Şemo dike û dibêje.

Sala 1937'an de Erebê Şemo li Pêtrogiradê (Lênîngirade) girtin û sirgûnî Sîbîryayê kirin. Piştî 20 salên zehmet e dûr û dirêj, (pey mirina Stalîn ) sala 1956'an, wî wa gotî "efû" dikin, dibêjin ku tu sûcê wî tune bûye, neheqî lê hatiye kirin. Ji wir vedigere Ermenistanê, Yêrêvanê. Dîsa dest bi jîyana wî ya siyasî, civakî û efrindariyê dibe. Çi ku salê sirgûniyê winda kiribû, şev û roj dixebitî ku wê valahiyê tije bike. Mala wî nava bajarê Yêrêvanê, ciyê herî rind, li kuça ser navê ronakbîrê ermenan Xaçatûr Abovyan bû. Heta niha jî li ser dîwarê wî tamî, ji bo hurmet û bîranîna nivîskarê mezin kevirekî mermer î gulover î bedew lê xistine û li ser bi zimanê rûsî nivîsare: "Vê malê da ji sala 1963'an heta 28 1978'an nivîskarê kurd û xebatçîyê civakî Erebê Şemo, Şamîlov jîyaye."

**Mirina Erebê Şemo**

Di hejmara 9'ê ya rojnameya "Roja Welat" de derheqa mirina Erebê Şemo de bi navê "Nivîskarê Mezin Erebê Şemo Çû Ser Heqiya xwe" nivîsek tê weşandin. Li wir behsa jiyana Erebê Şemo tê kirin û piştî mirina Erebê Şemo cih didin çend gotinên sersaxiya Erebê Şemo hatine gotin. Piştî mirina wî endamê Nivîskarên Yekitiya Ermenîstanê G.B Garibcanyan wisa dibêje: "Ereb Şamilov dengbêjê dostiyan cimata ermenî û kurdan bû ruhê wî ji kûraya xweliyê Ermenistanê hatibûn."

Helbesta ku ji hêla Erebê Şemo ve hatiye nivîsandin, bi sernavê "Strana Kurdan ji bo Destûra Soviyeta Nû" di hejmara yekem a kovara "Destkeftiyên Me" de li Yekîtiya Soviyetê de tê weşandin. Yek ji damezrînerê wê kovarê Maksîm Gorkî ye.

xwebûn

24-30 Gulan 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 75

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Elif Can Alkan
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Hinek êş hene gotin jê re bêkîfayet in



Keştiya Alalû
Agit Yazar

Riwayet ew e ku di wextekî de welatekî bi navê Frîgya hebûye. Ev welat, bê hikûmdar dimîne. Remildar dibêjin di nêzîk de kesekî bi gangilî/erebeya ga, têkeve bajarê wan, ew kes ew ê li ser textê hikûmdariyê rûnê û ew ê bibe keyayê wan.

Pir wext derbas nabe, kesek tevî erebeya xwe ya ga dikeve bajêr. Frîgyayî, wî kesî wekî keyayê xwe dipejirînin. Navê keya, Gordîon e. Li gor kehaneta remildar, dibin wê gangilîyê, ango erebeya Gordîon ya ga, bi şivterkên hilalkê bi perestegehê ve girêdidin. Bi hostahiyeke welê girêdidin, ti kes nikare wê girêkê verşîne. Navê wê girêkê datînin girêka "Gordîon" Paşê dibêjin heçî ew kesê vê girêkê verişîne, ew ê bibe hakimê parzemîna Asyayê jî.

**Çîroka Gordîon û Îskenderê Mezin**

Dem tê dewran dizivire. Îskenderê Mezin ji Makedonyayê tê. Riya wî bi welatê Frîgyayê dikeve. Hinek li ber guhê Îskender dixin û dibêjin hal û meseleyeke wanî heye. Erebeyeke ga, bi girêkuwîrkê hatiye girêdan. Her kî bikaribe wê girêkê ji hev verişîne, ew ê bibe hakimê parzemîna Asyayê.

Îskender yekser diçe li ba wê girêkuwîrka navdar ya Gordîonê. Dike nake nikare wê girêkê ji hev verşîne. Ê de ev Îskender e! Zû zû li ber ti buhuran nasekine. Îskender hêrs dibe. Şûrê xwe ji ber xwe kaş dike. Dibêje vîzt û davêje ji girêka Gordîonê. Girêkê dike du qet, davêje dera hanê.

Belê, kehanet dicebire û Îskender dibe hakimê parzemîna Asyayê. Lê kermêşek bi hikûmdarê Asyayê vedide û wî dikuje. Îskender, xêrê ji hikûmdariya Asyayê nabîne.

Têgotin, hingê Îskender bêhntengî kiriye. Ji dêlva girêka Gordîonê bi dest ji hev verişanda, bêtebatî kiribû û bi şûrê xwe girêk qet kiribû. Lema jî ew bi mirazê xwe şa nebûye.

Gava ez nîqaşên li navenda komela rewşenbîrên Zaxoyê, ya ku rewşenbîr xwe bi xwe di navbera hev de dikin guhdarî dikim, ev serpêhatiya Îskender û girêka Gordîonê tê bîra min. Ger rewşenbîr ev bin, nexwe xelkên ji rêzê çawanin gelo?

Ev çawa rewşenbîrî ye ku ne bi berhemên xwe yên hunerî, lê bi eşîra xwe xwe dipesinînin. Bê guman çend rewşenbîrên ku ji ber van nîqaşên erzan tengezar jî hebûn. Lê hejmara wan ji tiliyê destekî derbas nedikir. Heta nêviyên tilîkê destekî jî derbas nedikir.



**Li Başûr mijara eşîrtiyê**

Wer tê fêmkirin, ger li başûr tu merivekî bêeşîr bî, mîna tu merivekî bêjî bî, ew ê wanî bi wî çavî li meriv binêrin. Her tişt li gorî vê hişmendiyê tê birêvebirin. Liyaqet na, lê torpîla eşîrtiyê derbasdar e. Ev helwesta wan, sîrayetî hemû reh û rincên civakê jî kiriye. Ev hişmendiya kufikî, ya ku eşîrên Afrîkayê jî dev jê berdane. Lê hîn jî li başûr, bi awayekî gelekî berbelav derbasdar e. Vê aqilê eşîrtiyê, bi awayekî şênber civak sil kiriye, pûç kiriye, tevizandiye û bê vîn hiştiye. Lema jî, hemû kêşeyên wan, nola girêka Gordîonê lê hatiye. Heta em dikarin navekî nû li vê rewşê û li vê pirsgirêk-kuwîrkê bikin: girêka k(g)ordîonê!

Belê. Ev girêkuwîrka k(g)ordîonê, li benda Îskenderekî ye; Îskenderek were, şûrê xwe ji ber xwe kaş bike, bavêje ji girêkê, bike du qet û dev jê berde!

Min li Zaxoyê tam sêzdeh rojên qut û gilover li dû xwe hiştibû. Êdî bi derengî be jî ez berê xwe didim Hewlêrê. Axpînka çolistana ereban dîsa hewa herrimandiye. Li hewayê, edetî ewrê remilkê geriyaye. Ewrê meha nîsanê û bawîsoka çolistana ereban li hev geriyaye, li atmosferê edetî helawa ewr û toz tebarê gewimiye.

Hema ji zarokatiya min û vir ve çaxa wanî dinya reş dixeniqe, xofeke nayê ravekirin xwe li bedena min radipêçe. Bi qasî tê bîra min, di rojên wanî awarte de, kûçikên gund tevdekan bi hev re deng pevdixistin, bi sewteke zîz û tirsnak ber bi ezman ve dizûriyan.

Min paldaye cama erebê û ez ji xwe re diponijim. Ez xwe bi xwe ji xwe re dibêjim: Gelo kî dikare vê girêka k(g)urdîonê jihev verişîne û bibe hikûmdarê vê dojehê!

Hinek bobelat henin, gotin li hemberî wan bê taqet û têr nakin; ango gotin li hemberî wan bêkîfayet in. Meriv dike nake, meriv nikare wan bobelatana binivîse. Ez jî nikarim.

**Malbata dayika Şemê**

Li Wargeha Çemmişkan a penaberên êzidî em derbasî binê konekî dibin. Ev serpêhatiya xwediya malê ya dayika Şemê ye; gava DAÎŞ êrîş dike, pênc kur û du neviyên dayika Şemê di cî de dikujin. Du qîzên wê jî digel çend neviyên wê bi xwe re direvînin dibin. Qîzek wê avê li xwe dike û diçe bi cilên şil xwe bi ceyranê ve digire û xwe dikuje. Qîza wê ya din jî zenda xwe dibire û xwe dikuje. Heft heb neviyên wê, hîn jî di destê DAÎŞ'ê de ne.

Tişta min matmayî jî dihêle ew e ku, tevî ewqas karest hîn jî ev dayika hanê xwedî baweriyeke xurt a nehejîner e. Nola dibêje, ger meriv pola bûya jî dîsa meriv ê biheliya. Lê na! Dayika Şemê, ne dayikek ji wan dayikan e. Ev dayik, hemû taybetmendiyê dayikeke jinxasan e, di xet û derbirîna li ser rûyê xwe de dihebîne. Meriv ji sekan û metaneta wê re bengî dimîne.

Gava ez radibim li ser xwe û xatir ji wê dixwazim, nola ez biçim tewafa xwedawendekê, wanî diçim destê wê radimûsim.

**Li wargehê zarokê birçî**

Mazûbanê min, vîdeoyeke bi xwe li wargehê qeyd kiribû şanî min dide. Di kurtevîdeoyê de zilamekî navsere, digel sê zarokên xwe û hevjîna xwe ya astengdar di ser hev de digirîn. Dixwaze bipeyive, lê ji ber kela girî dev nagere tiştekî bibêje. Tenê tişta jê tê fêmkirin ew e, dibêje: "Ev serê du meha ye, xwarin di gewriya min û zarokên min de neçûye xwarê; tenê em bi nan û çayê îdare dikin."

Ez ji mazûbanê xwe re dibêjim: Ê ma çima tu min nabî mala wî bi xwe?Mazûbanê min bi fikar e. Lewra erkdar, ango berpirs naxwazin ev dirama dilguvêş were zanîn. Şêniyên wargehê, di bin mercên gelekî giran yên çewisandin û birçîmayinê de dijîn. Heke meriv bikaribe jêre bibêje 'jiyan'.

Mazûban li çavê min dinêre, ez li çavê wî dinêrim. Ew radibe dimeşe, ez jî didim li dû wî.

**Gotin û dîtin nabin yek**

Jixwe hemû kolanên wargehê dişibin hev. Em diçin li ba konekî disekinin. Mazûbanê min li derve bangî şêniyê malê dike. Dengekî lawaz, ew çend jî bê taqet ji hundur tê. Gava em dikevin hundirê konê naylonî, pêla êlmeke ji sefaletê jî wêdetir li ser çavê me dixîne.

Malxweyê malê li ser hestiyê piştê ye û lingên wî li ser balîfê, wanî ramedandî ye. Di her halê wî de diyar e go ji nêza ji zax/taqet de ketî ye. Xofeke neyê ravekirin xwe li laşê min dipêçe. Xwedê neke! di rewşê wanî de meriv dikare goştê hevûdu jî bixwin. Nola dibêjin: "Dîtin û gotin nabin yek!" Xwînerên ezîz, gelo di jiyana xwe de we tu car kesekî ji birçîna serberjê razayî dîtiye gelo?

Min paldaye cama erebê û em ber bi Hewlêrê ve diçin. Erebeyên me derbas dikin û yên ji hember de tên, ji her deh erebeyan şeş jê ji wan Jeep'ên lukus in, li rast û çepê me erdên beyar, yên necotkirî, li wargehan bi deh hezaran merivên betal û li ser zenga dirana birçî, li jor firtûneya toz û tebarê û ez ji zarokatiya xwe de ji rojên wanî reş-xetimandî ditirsim…

Qilîmayê, hundirê erebê tibabekî hênik kiriye. Ez rûyê xwe dispêrim cama derî a cemidî û em ber bi Hewlêrê ve diçin.

De min li jorê jî gotibû: "Hinek bobelat henin, gotin li hemberî wan bêkîfayet in. Ma ez ê bi kîjan gotinan bikaribim êşa dayika go daîşiyan goştê zarokê wê pê daye xwarin, bînim ziman?

## Penaberên welatê xwe!

Berî ez ji Zaxoyê veqetim, ez çûbûm Wargeha Çemmişkan jî. Li vê wargeha hanê 22 hezar penaber hene. Dibe ku hûn bibêjin penaberên çi? Belê. Penaberên welatê xwe!

Gava DAÎŞ, êrîşî li ser herêmên êzidiyan dikin, hingê yên ruhê xwe xelas dikin, xwe davêjin bextê gelê xwe. Li derdora 100 û 50 hezar kes tên li derdora Hewlêr, Duhok û Zaxoyê bi cih dibin. Ev Wargeha Çemmişkan jî, wargehek ji wan wargehên penaberan e.

Bi awayekî dostane ez têkiliyê bi berpirsê wargehê re datînim. Bi duayên derweşan, bi tirên gameşan ez diçim wargehê. Lê mazûvanê min, hinekî bi fikar e go tiştek were serê min û wî. Carna ew zaxê dide min, carna jî ez zaxê didim wî.

Em bi pîqaba mazûvan li nava wargehê digerin. Kolanên wargehê tije zarok in; nola mûristana gêrîkan xilxila zarokan e. Roja di asoyê de diçe xwar, siya konên wargehê dirêj kiriye. Kalemêran û pîrejinan jî xwe avêtine li ber siya dirêj a êvarê. Hin ji wan li ser kursîyên plastîk rûniştine. Diyar e li ser kursiyan jî westiyane. Lema jî gopalên xwe li pêş xwe di erdê de çikandine. Kefa her du destên xwe danîbûn li ser dar û wanî ji xwe re kirine destega sêyemin. Kalemêr û pîrejinên zêde westiyayî yên ji zax de ketî, çenga xwe jî danîbûn li ser pişta destên xwe yên li ser dêr û wanî di halê xwe de diponijîn.



## Lîstika 'koruk' an 'mangqelê'?

Hema bigire di her kolanê de û ji her çend konan li pêşiya konekî kalemêrên hîn jî li ser xwe bûn, li ser merşekê rûniştibûn û li ser textekî xwar ve hatibûn, wanî bi lîstikeke xerîb dilîstin. Navê wê lîstikê, jêre digotin 'koruk'.

Ez ne xelet bim, navê vê lîstikê di destana Dewrêş û Edûlê de jî derbas dibe û dengbêjan di destanê de, ji vê lîstikê re digotin lîstika 'mangqelê'.

Ez jî hema diçim li gel wan kalemêrên bi wê lîstikê dilîstin, rojbixêrekê li wan dikim û diçim li ba wan rûdinêm. Kalemêr ewqas di ser lîstikê de pêl bûbûn, hinek jê ji wan tew li min jî hay nabin. Yên li min hay dibin jî, bêyî serê xwe ji ser textê lîstikê rakin, bi serê lêvan silavê li min vedigerînin.

Lîstik jî ne lîstik e, tu dibêje qey rîtueleke ayînî ye. Kes bi kesekî re napeyive. Hem yên dilîzin, hem yên lê seyr dikin di ser text de diponijin. Diponijin û hey diponijin.

Textê li ber wan ji 14 kortikan pêktê. Heft li vî alî, heft li wî alî. Di her kortikekê de pênc kevirên bi qasî nokan hene. Lîstikvan, her carê radihêlin kevirên kortikekê û fer bi fer, zo bi zo li ser kortikên din belav dike. hema wer dinuqute dilê min, ez dibêjim ez heft salan jî li vê lîstikê seyr bikim, ez ê ti tiştî jê fêm nekim. Ji lîstikê ti tişt ber bi serê min ve naçe. Bi min wer tê ku ev lîstika hanê mêjiyê meriv ditevizîne. Yan jî sekna lîstikvanan vê îmajê dide min.

Digel ku ez dizanim dengê min li wan hay nabe jî ez dîsa jî xatirê xwe ji koma lîstikvanan dixwazim û em arasteyî kolanên wargehê dibin.